

Şimdi  
Barış  
Zamanı



Nehêlin ku ev  
hêvî vemire!

**Barkey û Fuller:**

Şansên bidestketî ji ber  
helwesta dewleta tirk ji dest çûn

Rûpel 3

**Zülküf Kışanak:**

Embazo Rojnameger  
Agît, Rûştî Yorgun

Rûpel 6

**İsmail Kose:**

Helbestvanê materyalîzma  
mîstîk Edonîs

Rûpel 10



NAVEROK



4

Çetin Mizan: Xebateke bicûk ji bo ferhengê



11

Nûçe: Televîzyona Kurdî bi roj jî bi me re ye.



13

Salihê Kevirbirî: Kovara Lêkolîn û Lêgerînê 'War'

Ji Xwendevanan

ÇEND rexneyên dostane digirim li mirovên kurd ên bê ziman. Belê a niha dilneketina ziman, têngihîştin e. Neparastina ziman, nedîtin e, nenasîn e. Mirov ji diya xwe bibe û navê wê nizanibe, navê bedena xwe, navê yara xwe, navê xeml û xêzên xwe... bila hûn bizanibin ku nenasîna van tiştan bi kurtebirî şerm e. Şermbûn jî di nav civaka kurd de di çî wateyê de tê gotin hûn dizanin. Heke ev gotinên min şaş bin, ez ji we re dibêjim, ger ez şaş bim, hûn rastîyê jî derveyî gotinên min dizanin; daxwaza min ji we heye, hûnê wê riya rast bidin ber min jî, ez jî ji xwe re tê de.

A niha ez çend minakan bidim: Em rabin çav li hemû sewalên dinyayê bigerin, gelo kê ji me dîtiye ku hehecik mîna ser xwinkê, ebabîl mîna balinayan, mih mîna bizinan bang dikin, an sewaleke ne bi zimanê xwe, lê bi zimanekî terabe dixwîne.

Heke ev ne bes be dîsa minakekê bidim. Rojekê rêvî dilê wî gelekî dibije meşa tajî, biryara xwe dide ku ew jî mîna tajî bimeşe; dest bi meşa xwe dike, gavek, dudu, sisê, lê dinihêre ku serfiraz nabe, biryara xwe şûn de distîne ku vegere ser meşa xwe ya kevn, lê belê dike nake nikare êdî bi awayê xwe yê berê jî bimeşe. Li ser vê yekê rêviyê xasûkî dibe xwediyê meşeke terabe. Nedilketiyên zimên, ger em jî bixwazin em wekî rovi nebin xwediyê zimanekî terabe, pêwîst e ku em her mirov û kesayeti barê xwe hilandin ser-milên xwe.

KEDKAR ÇÎN / BURSA



Dengê aşîxwazan gurtir dibe

SAMÎ TAN

Çalakiyên li ser Trêna Aştiyê hêdî hêdî rojevê dadigirin. Trêna ku di 26'ê mehê de dikeve rê, tê plan-kirina ku di 29'ê mehê de bigihêje Stenbolê û di 1'ê rezberê ango di roja aştiyê de bigihêje Amedê. Çalakiyên amadehiyê, bi hemû gurehiya xwe didomin. Gelek rewşenbîr û kesên navdar ên tirk, kurd û ewrûpî jî piştigirîya xwe ji bo vê çalakiyê diyar dikin. Kesên azadîxwaz, dixwazin bi vê çalakiyê rê li ber aştiyê vekin.

Divê bê gotin ku derdorên faşîst û kevneperest jî destvala nasekinin. Êdî piraniya kesên ku li ser şerê li Kurdistanê lêgerîn û lêkolînê dikin jî dipejirînin ku ew derdor bi şer xwe xwedî dikin, lewre jî çareseriyê naxwazin. Bo nimûne partiya faşîst biryar standiyê ku ji bo astengkirina hatina Trêna Aştiyê serî li hikûmetê û serokomarê tirk bide. Her wiha berdevkên MHP'ê jî dane zanîn ku heke, rê li ber hatina trêne neyê girtin, ewê dest bi-avêjin protestoyan. Ji roja ku Tûrkeş miriye vir de, yekemîn car e ku ev partî helwesta xwe ya qirêjî diyar dike. Piştî mirina Tûrkeş, gurên boz bi hev ketin, paşê li

hev hatin, lê hê jî xirecira di navbera wan de ji holê ranebûye.

Sedemeke qelsbûna wan jî hinekî ji ber helwesta artêşê ya li hemberî wan bû. Tevera Susurlukê li hemberî wan bû jî, ji ber ku tîmên taybet û çeteyên di nava dewletê de, bi piranî alîgirê vê partiyê ne. Bi Susurlukê derbeyeke mezin li wan ket, bi mirina Tûrkeş dengê wan kêmbû, lê ji ber ku dilê dewletê tune ku di warê kêşeya kurdî de tu gavan biavêje, vê partiyê û çeteyên wê jî nû ve derdixe pêş.

Li aliyê din rayedarên dewletê yên ku heta van rojên dawîn helwesta xwe nedabûn der, hefteya çûyî helwesta xwe ya bêxêr diyar kirin. Cîgirê Berdevkê Wezîrê Karê Derve yê Tîrkiyeyê Sermet Atacanlı, ev çalakiya aştiyane wekî propagandaya PKK'ê bi nav kir. Lê Atacanlı rasterê negotiye, em nahêlin ku Trêna Aştiyê bikeve nava Tîrkiyeyê.

Piştî diyarbûna helwesta rayedarên tirk çapemeniya şerxwaz jî dest bi nûçeyên li dijî vê çalakiyê kir. Hinek jî wan wê wekî "qaşo Trêna Aştiyê", hinek jî wekî "Trêna PKK'ê" bi nav dikin.

Helwesteke qirêjî jî, ji partiya Perînçek bilind bû. Cîgirê Serokê Partiya Karakeran (!) Bedri Gültekin, li ser vê çalakiyê civîneke çapemeniyê li dar xist û ew çalakiyê wekî "destkariya împeryalîstan a di karê hundirînê Tîrkiyeyê de" nixand. Gültekin ev çalakiyê wekî "Trêne Sevrê" bi nav kir. Ev gotinên wî, nixandinên Lenînen der barê sosyal-şovenîstan de tîne bîra mirov. Wisa xuya ye ku şovenîzmê belkî jî tirêja biriqîna tanqan çavê wan kor kirine. Lewre çavên wan hevalbendî ya generalan û împeryalîstan nabînin, lê vê çalakiya derdorên demokratîk ên ewrûpiyan ji bo nîşandayina helwesta xwe ya anti-împeryalîst(!) dikin hincet. Rayedarên vê partiyê rûmeta sosyalîzmê deynin aliyekî, ya kemalîzmê jî xistine binlingan. Qet bala xwe nadin ka di milê ke de ne. Wan berê ji bo alîgirên sîstema sovyetê digotin "sosyal-faşîst", lê niha ew nav gelekî xweş li bejn û bala wan tê.

Di dawiyê de mirov dikare vê bibêje: her hal wê faşîst û sosyal-faşîst bikevin milê hev û êrîşê binin ser vê çalakiyê, lewre ev çalakiyê ji bo çareseriyê xala veçerxê ye. Heke rayedarên tirk rê bidin jî, nedin jî wê hêza azadîxwaz û aşîxwazan zêdetir bibe. Her wiha wê kêşeya kurdî zêdetir bikeve rojeva raya giştî ya navneteweyî. Ev yek jî hêzên paşverû di-tirsîne.

Şexsiyet û taybetiyên neteweyî

ALAATTİN AKTAŞ

Hebûna gelê kurd, digihîje kûrahîya dirokê. Civaka kurd, berî îro nêzikî 3 hezar salî şeveqa dirokê qetandiyê û derketiye hola jiyane.

Mirov giyanewerêkî civakî ye û taybetiyên xwe yên mirovatî ji civaka ku di nav de dijî, girtiye. Li gorî vê yekê mirovê kurd taybetiyên xwe yên mirovatî ji civaka kurd girtine. Mirovên ku ji rêwîştaya xwe ya neteweyî qut bibe, ew şexsiyeta xwe wînda dike, vala dibe û di valahiyê de sêwî dimîne; wekî pelê daran bi berba dikevin. Ba, wan bi ku de bibe, di wir de diçin. Mirovên wiha, pir bi xetere ne; mêtîyê wan wekî kaseteke vala ye, kî çawa tiji bike, wisa diaxivin; wekî kurdên ku dixwazin şexsiyeta neteweya tirk bigirin, di destê kedxwar û zordestên tirk de dibin wekî xencereke destîrêş û li hemberî gelê xwe û mirovatîyê pir xeternak tîne xebitandin.

Di vê babetê de, gotinên me ne li ser xayinan e; pirtir ji bo mirovên ku hatine pişafîn û nasnavê xwe yê neteweyî wînda kirine. Ji ber ku mirovê bê dirok wekî dara bêkok e. Mirovê bêdirok xwe nas nake, bê serûber e; kesê ku xwe nas nake, di nav civakê de xerîb û bêkes dimîne; jiyana wî, hêviyên wî û hemû pîvanên wî, ne yên mirovatîyê bi rûmet in, jiyana wî jî bêrûmetiyê tu car xelas nabe.

Kesên ku şexsiyeta xwe ya neteweyî

Taybetiyên me yên neteweyî gul û kulîlkên jiyana me ne. Bila koma miletan bi vejîn û rizgariya me ya neteweyî, baş bihesin. Zimanê me, xaka me, çanda me, dirok û giyanê yekbûna me, rûmet û şerefa me ye.

Î wînda kirine, ew zû bi zû nabin welatparêz û şoreşger jî. Bela ku der heqê welat û neteweyan de, di hiş û dilê wan de tiştek nemaye; bê evîn, bê zêmin û bê giyan in jî. Mirovên wiha di nav tîkoşînê de xerîbiyê dikişînin û dibin bela li serê şoreşê. Yên ku xwe di nav şoreşê de nehêlin û nebin evîndarê welat û taybetiyên neteweyî yan wê birevin cem dijmin û yan jî wekî termekî wê di nav tîkoşînê de bêhn bi wan bikeve, wê birizî. Şexsiyeta neteweyî, berî her tiştî, ji bo her dab û nêritên neteweyî eşq û evîneke mezin, di dil de agirekî geş û şewat dixwaze. Şexsiyeta neteweyî, berî berjewendiyên kesitî malbatî û eşîrî, berjewendiyên neteweyî û ji bo van berjewendiyên fedakarî û xebateke ji dil û can, dixwaze.

Sersedema windakirina şexsiyeta me ya neteweyî mijokdarî ye. Dijmin hemî taybetiyên me û parastina diroka me qedexe kirine û di şûna yên me de, bi zordestîyê mezin taybetiyên xwe yên lewîfî li ser me kirine ferz. Di dema tarî de kesên ku bixwesta jî, nikaribû bi serê xwe li hemberî dijmin tiştêkî zêde bike. Lewma di vî warî de kes zêde gazinan jî

nake.

Lê belê îro, tîkoşîna serxwebûn û azadiyê, ji bo şikandina pişafînê, ji bo vejîna neteweyî û ji bo hevdiîna kokê neteweyî her tişt aniyê ber lingên me digihîştîyê malên me. Qedexkirina dijmin jî êdî kar nake.

Taybetiyên me yên neteweyî gul û kulîlkên jiyana me ne. Bila koma miletan bi vejîn û rizgariya me ya neteweyî bi eşq û evîndariya me ya mezin baş bihesin. Zimanê me, xaka me, çanda me, dirok û giyanê yekbûna me, rûmet û şerefa me ye; Şehîdê welat hemû di heş û dilên me de ne, bila ev ala neteweyî, wan bawesînê bike.

Ev roj, roja tolhildanê ye. Rabin! Kulmên xwe bişidînin û wekî mizrabê Kaw bişixulînin. Rabin! Em zarokên tolhildanê ne, narîncokên qertik kişandinê ne em leşkerên Zilan, Rewşen û Bermalanê. Dijmin şexsiyeta me dagir kiriye wekî kurme mirinê xisûsiyetên dagirkeriyê şexsiyeta me dikûjin. Werin em serî van kurman biperçiqînin. Werin ewil erdagirkeriyê di şexsê xwe de bişikînin, bi kujan û xwe paqij bikin, ala xwe ya neteweyî li ser şexsiyeteke paqij bipêçin.





Li gorî rapora TIHV'ê ya sala 1996'an ya ji maxdûrên îşkenceyê % 61.4'ê kurdistanî ne. Di raporê de, lê diyarkirin ku, di sala 1996'an de ji nava 576 kesên ku serî li TIHV'ê dane û îşkenceyên giran dîtine, % 36.9'ê wan ji Başûrê Rojhilatê ne, % 24.5'ê wan jî, ji Rojhilat in. Di raporê de rêjeya kesên li herêmên tirkî li ber herêmên kurdistanê gelek kêmtir e: % 6.6 Herêma Bahra Spî, % 6.5 Herêma Anatoliya Navîn, % 3.9 Ege, % 3.1 Marmara û % 2.2 ji Herêma Bahra Reş in. Her wiha di raporê de diyar dibe ku zarok jî, ji van îşkenceyan nesibên xwe dîstînin. Dîsa digel kesên siyasî, gelek ên adlî jî hene di nav maxdûran de.



**NIVISANDINA** 400 saliya "Şerefname" ya Şerefxanê Bedlîsî, roja 14'ê gelawêjê li paytexta Ingilîstan Londonê hate pirozkirin. Di civîna ku gelek ronakbîr, siyasetvan û hûnermend beşdar bûne de, Lêkolînan û Nivîskar Anwar Soltani, Dr. Botan Ferat û rewşenbîrê îrani Saîd, wekî semînervan beşdar bûn. Her wiha serokê PKDW'ê Yaşar Kaya û Lord Rea, der heqê girîngiya şahesera kurd de axivîn. Di civîna ku ji çar helên Kurdistanê bi sedan şexsiyet anîbûn cem hev de, pêwistiya Şerefnameyê ji bo gelê kurd û Rojhilata Navîn hate zimên. Civîn jî hêla Navenda Çanda Kurdî, Navenda Raglîhandina Kurd, Weqfa Saone û Qempanyaya Aştîyê ve hate organîzekirin.

## NÛÇE

Henri J. Barkey û Graham E. Fuller:

# Şansên bidestketî ji dest çûn

Di nivîsê de ji ber afirandina sîstema cerdevaniyê û fîmên taybet Özal jî tê rexnekirin. Lewre bi afirandina van hêzan, komeke ku ji şer xwe xwedî dike derketiye holê.

Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê digel raporên ku li ser navê wezaretên xwe dide amadekirin, hin caran bi riya hinek rêxistin û lêkolîneran dîtînen xwe radigihîne raya giştî ya cîhanê, bi vî awayî jî nêzîktêdayîna derdorên tîkildar hîn dibe.

Gotareke bi vî rengî berî ku wekî pirtûk derkeve ji derdorên tîkildar re hatiye şandin. M. Ali Birand di quncikê xwe yê di rojnameya Sabahê de, di bin sernavê "Bi Çavê Amerîkiyan Kêşeya Başûrê Rojhilat" de çend hefteyan li ser vî gotarê an jî bi navê xwe yê ras-nîv raporê nivîsî. Her wiha Mebûsê Kurd Hatip Dicle jî roja 18'ê gelawêjê di quncikê xwe yê di Rojnameya Ülke de Gundemê de digel hîn tiştên din qala vî gotarê jî kir. Em dixwazin li vir digel vî gotara navborî ku ji hêla Henri J. Barkey û Graham E. Fuller ve hatiye nivîsandin, qala gotareke din bikin ku dîsa ji hêla Henri J. Barkey ve hatiye nivîsandin. Lewre ew jî ji heman çavkaniyê gihîşt destê me û ew her du gotar hev û din temam dikin.


Navê rapora ku bi giranî li ser hatiye rawestîn "Turkey' Kurdish Question: Critical Turning Point and Missed Opportunities (Kêşeya kurdî ya Tirkîyeyê: Hinek xalên veçerxê yê krîtîk û şansên ji destçûyî)".

Di destpêka gotarê de tê gotin ku şer roj bi roj li derve û hundir bi hejmareke zêdetir kurdan dikişîne nava xwe û wan bi rê dixê. Agahiyên giştî li ser encama şer bi awayekî objektîf tînin dayîn. Bo nimûne tê gotin ku Tirkîya % 3'yê hemû Dahatûya Hundirîn a Giştî (GDP) li şer xerc dike û zêdetirî du hezar gundan hatine valakirin. Wekî encama vî politikayê bajarên mezin tîjî koçber bûne, piraniya wan jî bêwar û bêkar mane. Nivîskar wekî minak didin zanîn ku % 80'yê ciwanên koçber ên ku hatine Edeneyê kar bi dest nexistine. Piştî re jî tê diyarkirin ku "Politikayên leşkerî ku bi armanca kêmkirina hêza raperîne hatine meşandin, piçêkî xêra wan gihîştibe dewletê jî, bûye sedem ku PKK ji nav ciwanên koçber jî xwe re şervanan peyda bike."

Di bin sernavê "Kêşeya Kurdî" de nivîskarên gotarê li gorî dîtina xwe kêşeya kurdî rave kirine û nêzîktêdayîna dewleta tirkî rexne kirine. Tê gotin ku kêşeya kurdî ne kêşeyeke aborî û terorê ye, lê kêşeya nasnav û qewmîyê ye. Di gotarê de tê daxuyandin ku ji ber helwesta rayedarên tirkî PKK bûye hêza sereke ya kurdan.

### Xalên veçerxê

Di bin sernavê "Xalên veçerxê yê krîtîk" de jî li ser bûyerên ku bûne sedema geşedana nasnavê kurdan a neteweyî tê rawestîn. Ev her sê xalên veçerxê; salên ayabûna komarê, salên 1950 ku rejîm derbasî pir-partîtiyê bûye û salên cuntaya leşkerî ne. Di nîrxandina her



du nivîsan de jî şerê kendavê û koçberbûna gelê Başûr wekî sedemeke xwenaskirina kurdan hatiye destnîşankirin. Her wiha di nivîsa Fuller û Barkey de wekî sedemeke duyemîn jî, qutbûna tevgera kurdî ji tevgera çepgir a tirkî hatiye nîmandin. Di bin sernavê navborî de dîr û dirêj aliyê dîrokî yê kêşeya kurdî hatiye nîrxandin. Nivîskar parçebûna Kurdistanê wekî sedemeke lipaşmayîna aborî destnîşan dikin.

### Şansên jidestçûyî

Di bin sernavê "Şansên jidestçûyî" de du minak hatine dayîn; dema hikûmeta 1991'ê û agirbesta PKK'ê ya 1993'yan. Digel gelek sedemên din nakokîya di navbera Demirel û Özal de û paşê jî mirina Özal wekî sedema şansên bidestketî tînin bilêvkirin. Di nivîsê de ji ber afirandina sîstema cerdevaniyê û fîmên taybet Özal jî tê rexnekirin. Lewre bi afirandina van hêzan, komeke ku ji şer xwe xwedî dike jî hatiye derketiye holê.

Tê gotin ku ji ber oto-sansûrê haya gelê tirkî jî tiştêkî nabe. Her wiha nebûna gengeşîya li ser kêşeyê jî nahêle ku çareseriyêke siyasî jê re bê dîtin. Nivîskarê amerîkî didin zanîn ku PKK piştî agirbestê hê xurtir bûye, lewre daye zanîn ku bi qasî şer, di taktîkên siyasî de jî jêhatî ye.

Di dawîya gotarê de tê gotin ku şansên bidestketî ji ber helwesta rayedarên tirkî ku ji bilî şer riya çareseriyê nabînin, ji dest çûne. Li bajaran derneketina dijîmînatîya kurdî û tirkî û nebûna hewla PKK'ê ji bo çalakiyên mezin wekî aliyekî erênî tê nîrxandin. Dîsa tê gotin ku HADEP'ê di hilbijartina 1995'an de, hêza xwe daye selmandin.

### Tirkîya çeper li xwe teng dike

Di gotara Henri J. Barkey a bi navê "Under The Gun: Turkish Foreign Policy and The Kurdish Question (Di bin siya çekan de: Politikaya derve ya tirkî û kêşeya kurdî)" de jî tê gotin ku digel ew qas hewla dewleta tirkî jî tu nîşaneyên tîkîna PKK'ê li rastê nînin in.

Helwesta dewleta tirkî a li hemberî kêşeya kurdî wekî tengasiya sereke ya li ber geşedana tîkîliyên wê, tê binavkirin. Tê gotin ku heke dewleta tirkî vî kêşeyê çareser neke, dibe ku li ser rûyê cîhanê bi tenê bimîne.

Dewleta tirkî li aliyekî PKK'ê wekî dijîmînekî sereke bi nav dikê, li aliyê din, qala nebûna piştigiriya gel a ji bo PKK'ê dike. Ev nakokî dihêle ku PKK bi çalakiyên xwe yê leşkerî, di warê siyasî de xurtir bibe. Dîsa tê gotin reaksiyona tîj a dewleta tirkî a li hemberî civînen PKDW'ê dibin sedem ku ew civînen jî rêzê, hê zêdetir deng vedin.

Her wiha tê diyarkirin ku hebûna kurdan li Ewropayê bi taybetî jî hejmara kurdên li Almanyayê dike ku ew dewlet jî bo çareseriyê zêdetir serê xwe biêşînin.

Dîsa şerê li Kurdistanê dibe asteng li ber projeyên dewletê yê li şer gaz û petrola li Asyaya Navîn, qulpekî dide destê Rûsyayê. Navneteweyîbûna kêşeya kurdî, wê derdixe derveyî kontrola dewletê.

Di dawiyê de tê daxuyandin ku stratejiya ku hemû daxwazên kurdî bi PKK'ê ve girê dide, ji bo niha tirkî li hemberî van daxwazan dike yek, lê ew stratejî wê li xwediyê wê vegere. Bi helwesta xwe dewleta tirkî bi destê xwe dîwaran li dor xwe lê dike.

SAMÎ BERBANG



# Xebateke biçûk ji bo ferhengê

Karê berhevkirina berhemên zargotînî di warê geşedana çand û zimanê gekekî de gaveke girîng û mezin e. Her wiha bi qasî vê yekê berhevkirina peyvên herêmî ji alîkariyê baş e ji bo kesên ku li ser zimên û ferhengeke berfireh xebatê dikin. Hevalê ÇETÎN MÎZAN, ji bo rênîşandariyê ji herêma Mêrdînê hinek peyv berhev kirine. Bi hêviya ku ev bibe gava yekemîn em vê xebata wî diweşînin.



Ji ber ku li gundan jiyana gelê kurd a rojane gelekî bi bizav û tevger e, di vî warî de gelek peyv hatine afirandin. Lê mirovên me yên li bajarên ji ber polîtîkayên dewletê yên pişafkar, piraniya van peyvên ji bir kirine.

**W**ekî tê zanîn fergengeke zimanê kurdî ya dorfireh û bi rêk û pek, heta niha çênebûye. Lê divê rojekê berî rojekê xebata ji bo ferhengê dest pê bike. Dibe ku ev xebat ji aliyê hinek nivîskaran ve tê kirin, lê heta niha ji bo alîkariyê tu bang nehatiye weşandin.

Ji ber vê yekê û ji ber ku ez jî dixwazim alîkariya amadehiya ferhengê bikim, hinek pêşniyazên min hene û min hinek peyv bi azîneya (metod) li gorf xwe berhev kirine. Ez dixwazim vê azîneyê diyarî nivîskar û rewşenbîran-bikim. Ev azîneyê ne tiştekî zor e. Her mirovê ku dizane bi kurdî binivîsê, dikare bi vê azîneyê li herêma xwe gelek peyvên berhev bike. Ev azîneyê wiha ye:

1-Divê herkes peyvên ku li herêma wan tînan bikaranîn berhev bike.

2-Divê bi sermavan û beş bi beş berhevkin. Mînak: Di warê aborî de, çi devok li herêmê hebin û tîne bikaranîn divê rêz bibe, yan jî di warê bîriyê de, di warê paleyîyê de, di warê rezan, nexweşî bedena mirov û hwd. de.

3-Di beşekê de peyvên heyî, çi navdêr bin çi jî lêker û hwd. bin, divê bêne nivîsandin û wateya wan li hemerî wan bê dayîn.

4-Divê mirov ji bo vê yekê ji mirovên pîr an gundîyan sîdê wergire.

Ez dixwazim peyvên ku bi vê azîneyê min dane hev, diyar bikim û ji her beşê hinek peyvên binivîsim. Ev devoka li herêma Mêrdînê tîne bikaranîn.

## Çol, daristan, çiya

Axrêk: Riya axê, an peyarêk  
Avzêm: Kanî, kaniya her tim av jê tê.

Axkenk: Kana axê, cihê ax jê tê kişandin.

Beroj: Pala çiya ku tav didê.  
Best: Cihê ku avê di nava du tilman de çêkiriye (bestik)

Çal: Korta bi desta û ji bo tiştekî çêdibe.

Dixan: Dûman, bayê bi toz û gemar.  
Êlax: Devera bi giha û dûz.

Guher: Cihê ku her tim mexelê sewalan e.

Neqep: Riya di bendan de derbas dibê, an nava du çiyayên ku pir nêzî hev in.

Şûv: Erdê ji bo bêhnvadê ajotî

## Navê sewalan

Avzelêlik: Mêşa ku li ser avê digere û zelal dike.

Bêtik: Çivîkên li nav malan û li kolanan dijîn.

Baçimêlk: Gaperçevk, şevşevok, şevrevîng, perçûmek (yarasa)

Balfzerk: Ya ji marmarokan mezin-tir û zer e.

Cewrik: Têjikên kûçikan.

Çikcigok: Navê çivîkeke ku bi taybetî di qulên tahtan de dijî.

Û yên din: çêlkew, cahnik, dik, dûpişk, ferxik, ga, qedene, hehecik, pezkovî, wawik, sixur, sihorîk, kulî, rişk, marmasî, kurm, kêzik, sîsik, tîfî, başoke, zerdole, maşot, kelmêş, pêşî, kund, qumil, reşêle, xilt, kêrgo, bet, fisteq, şa-

kulî, qijnik, diksilêman, şeytanok, zîro, meqesok û hwd.

## Aborî

Kirîn: Sitendina tiştekî bi diravan.

Firotin: Dayîna tiştekî bi diravan.

Lihevkin: Di bazara tiştekî de li hev hatin.

Buha: Berdêl an zêdeyî heqê xwe

Û yên din: Vegerandin, dezge, bazar, quta, erzan, peyase, ribik, nivbirik, olçek, nivolçek, pîvan, weqî, tuxt, mêzîn, ebir, misqal, rastimal, qeys, liberhevixistin, daman, serbiser, bazirgan, etar, cambaz, dezge û hwd.

## Zerde, mewe, giya

Încaz: Erûk

Bacanê reş: Patlican

Gêzer: Gizêr, gezêr

Û yên din: Zebeş, petêx, kalik, xiyar, qitî, şimamok, îsot, tûtîn, pelê silka, silk, guwîz, binerdik, kal, nebûyî, guhîj, tehew, bî, helalik, berrû, mazî, şeqelor, kerrik, tevrik, qeresî, ecûr, şelengo, êmîdî, mijmijok, baqil, dobelan, pirpar, pîvok, frêz, gurnîk, xerdel, qarûş, axbindir, reh, kok, qûrm, hejîk, pejik, lablabik, hijîr, mişmiş, strîzerk, kenêre, bitim, bihiv, zîwan, kereng, sipîng, tirşok, şikoke, tolik, dirîreşk, gulşilav (kuşburnu), rezik û hwd.

Bedena mirovan: Por, simbêl, ser, enî, mijank, birû, çav, poz, rih, cênik, çeng, lêv, dev, diran, pîdî, ziman, firnik, stû, sing, guh, nermik (a guh), zengelok, qirik, kerrik, qolinc, mil, dest, ti-

lî, parsû, enîşk, nenûk, zik, çerm, ran, reh, kulêmek, çong, panî, guwîzek, kirronek, lûle, rêvî, dil ceger, pişik, kezêb, zirav, gewrî, ronik (a çava), reşik, hêt, pûrt, bengeloşk û hwd.

## Rez, xerzik

Xerzik: Rezê ciwan (yê ku nû hatiye danîn).

Beran: Rêza darên mêwan

Dêlî: Mêwên ku nayên birîn

Nerdan: Tevrika binê mêwan

Û yên din: Rez, kox, marzone, sêrek, havînge, esorvan, kewde, kûre, nahtorî, zembîl, kufe, birrîn, maşot, bastêq, kêşmûn, mewîj, hersim, kûlorîk (ya bi hevîr, ji dimsê û hevîr çêdibe), qotkirin, beranweqe, telis, qufe, çirik, esar, cembek û hwd.

## Bûk û Dawet

Şabaş: Hunermendê dawetê kû şabaşê dikşînin.

Berbû: Yên ku diherin-bûkê tînin

Rehel: Çeyiz

Xêlî: Paçê di ser serê bûkê de dakirî (gelinlik) û yên din: Bûk, zava, xesû, xezûr, dilan, dûcîde, delîlo, dergîştî, qelen, dûrik, xelat, hine, bêrbilik (mal-xerab), bazin, xeftan, xwazgînî, devdêrî, sergirêdan, berderî, berekîmî, berqocelî, çarpîne, lîrandîn, bilûr, berdêlî, hinevanî, berbangî, eyûn, sergovend, birazava, qorotî, peza aziba, xal, xwarzê, ap, birazê, bixaltî, sêlek, zarok, buxçik, şerbihê roniyê, kember, kirîb, telaq, fitû, mahr, zêdî, gulî, sibahî, û hwd.



## Bêrivanî û pez:

Zewêdî: Yê ku êvarî dihere ba şivan, ji bo şevê.

Dandî: Dema ku berxan berdidin nava pez ji bo şîrxwarinê.

Mexel: Cihê ku pez lê mexel tên.

Alinc: Di nîvê mexela nîvro de pez radikin ji bo çêrê.

Alif: Cihê ku em dixinê.

Û yên din: Bêrivan, şivan, col, kerî, şevîn, dan, karik, berxik, virnî, hillî, şemze, kulav, nêrî, top (nanê sehê şivan), kavir, axur, kozik, dotin, şîr, mast, çortan, dew, dekil, hirî, liva, meşk, kedik, elbik, serbanê, havên, guher, toraq, nivîşk, erebreş, ilori, beranxwarin, zo, em, fîro, tiştîr, xwêdank, xesandin, hingil, ferşik, xwêdank, soring, kemêl, dûv, sim, guhan, lolip, çorî (darê meşkê) û hwd.

## Tevn

Hepo: Şehê hesinî ku pê li tevnê dixin.

Tevnî: Darê ku ta pê ve girê didin û didin paş sîngan.

Bevs: Textê panik ku ta tîne dihûne.

Hevring: Meqesê ku sewalan kur dike.

Û yên din: Tevn, kurîşk, merş, tejik, terahe, teşî, teşîrê, gilok, şûjin, rîs,

derzî, dolav, çirik, şehmû, sêpêk, werîs, masûr, pîj, gurd, sêwan û hwd.

## Cil û alavên malê

Cil: Kinc (bedil) yên ku mirov li xwe dikin.

Berstikur: Pêşiya fanêre; cihê vekirî

Hûçik: Li hin deveran paçikekî ku bi milên xwe û piştî xwe ve girê didin.

Heqîb: Têr.

Çoçik: Heska biçûk

Û yên din: Paç, xeftan, sol, kiras, derpi, gore, kofi, pêştmal, devdeling, pêxîl, doxîn, papîk, lepik, qayîş an kember, fanêre, xişre, morik, bêrîk, tûr, cuher, kîs, hevîr, teş, rohevîrk, girik, livîn, lihêf, zemberîş, qafik, lûle, erdî, moxil, tarik, bêjing, serrad, kulav, bi-zot, koz, agir, gurî, şûnik, rûlihêf, deribandî, teraf, piştîk û hwd.

## Xanî û Avahî

Rik: xerc (herî)

Navbir: Dîwarê hortê,

Benig: Balqon, dik

Înzêr: Holik

Merkeb: Selîka herî mezin

Daşir: destavxane

Û yên din: Dîwar, kevir, çeng, beş, kils, mirciyaq, sitrax, kadîn, pinêrî, pêlik, serderî, serşok, kewar, tifik, kuçik,

sitûn, serstûn, kefik, çakûç, şafûl, ber, tevri, misîn, bivir û hwd.

## Dan, destar, xwarin

Mîrkut: Yê ku pê dan dikutin, Serbizêr: Bilxura ku nîska tevlê dikin.

Çaqilmast: Dewê ku baş nehatiye kilandin

Û yên din: Bilxur, sindik, dan, curm, hêrandin, destar, destik, ardilosk, xişan, kapek, hêrayî, girar, tilîşewitî, mehîr, şorbe, serbidew, şapik, tirşik, serûpê, şamborek, kûtilik, şilikî, nanê şikeva, belloh hebnisk, qelandin, kelandin, otik, û hwd.

## Paleyî

Bax: Gurzê sapên genim an yên diçin

Qefle: Gurzê ku didin ser hev Rewake: Qefleyê ku hê pir didin serhev,

Gidiş: Komê sap yên herî mezin

Û yên din: Şixre, bendeke, diraxe, cercêre, mehlêb, cot, bender hefsar, nal, lod, gêre, dor, serdor, bindor, qiyale, gîsin, misas, hewq, navteng, das qolûçik, nûr, halet, labût, liqat, bizar, eşêf, sersed, şûv, îfare, simil, şolîk, ceh genim, zixt, libakirin, binbender, qeşawî,

pirêze û hwd.

## Tendirustî û nexweşî

Bapêş: Nezle

Rîş: Şêrpençe (kansêr)

Sikrat: Dema li ber mirinê, hilma distîne.

Û yên din: Zerik, sorik, pizik, heftûzik, mîrkûtok, şerbê, emel, jinzirav, birîn, bapêş, sikêş, ta, belalûk, peq, bûk, gurî, qop, kulek, jahr, jahrdadayî, tîr, qolîncî, ba kwînêr, otik, bîrov, mezêl, kefen, tabût, gor, bergor, meyt, term, tîhêl, mewîjok, bawesîr, eşûk û hwd

(.....)

Mîrov dikare van beşan hê pir bike û mirov dikare hê pir peyvî binivîse, lê ji bo mînakê min ew qas nivîsîn. Bê guman, di nava van peyvî de yên ne bi kurdî jî dibe ku hebin, lê dema mirov baş binixîne, ji nava wan mirov dikare bineqîne. Dîsa li gorî herêman peyvî cihê cihê hene, lê ev peyv li derdora Mêrdînê tene bikaranîn. Ez bawer im ku her kes wê li devera xwe karibe peyvî bide hev û din. Dema ku her kes bide hev û jî Înstîtûyên Kurdî re bişînin, vê tiştêkî gelek xweş bê holê.

Mîrov dikare van beşan hê pir bike û mirov dikare hê pir peyvî binivîse, lê ji bo mînakê min ew qas nivîsîn. Bê guman, di nava van peyvî de yên ne bi kurdî jî dibe ku hebin, lê dema mirov baş binixîne, ji nava wan mirov dikare bineqîne. Dîsa li gorî herêman peyvî cihê cihê hene, lê ev peyv li derdora Mêrdînê tene bikaranîn. Ez bawer im ku her kes wê li devera xwe karibe peyvî bide hev û din. Dema ku her kes bide hev û jî Înstîtûyên Kurdî re bişînin, vê tiştêkî gelek xweş bê holê.

# Nûman

## MEDENÎ FEERHO



Sernavê nivîşa min navê xortekî fileh (suryanî) e, ku dema min ew bi zilmî nas kir, xeta simbêla nû rast dikir. Kî dizane, mîna her xortê nû gihîştî, xwedêgiravî, ew çend car bûn ku cuzan li rûdêna xwe ya di nava ronahiya tîrnîgarî de bi xemla xortaniyê geş, dabû. Di rûdêna wî de vê rewşê xwe kifş dikir. Tiştê din î pir seyr û ecêb çirîsîna reşîka çavên wî bû ku ne tîrêjî, nof bi nof li dûv hev mîna cewhera xalî li ser atlasa xencera Îsa Begê diwelihi. Xarîkên çavên wî, bi reşîk û spîtiya xwe di nava ronahiyek geş û tîr hêvî de berawajî hev û din dibûn. Lept û livandîna wî jî li gorî her du çavên tîr ronahî bê rawestandî û amadehî pêkanîna karûbar bû.

Nûman, xortek ji wan xortên gundê M. ye ku binbariya pêşerojê Kurdistanê bi payidariyek hevbeşî û tîgihîştîneke dîrokî daniye ser milên xwe. Ji roja ku şerbîkê şerabê danî pişt deriyê odeya ku ez û mêvan lê rûniştibûn bi vir de, di nava refê gerîla de kar dike. Ew şerbîkê karê Behwarê kû şeraba tîriyê rezê Êwertê tê de, ev deh sal in ku hê jî li piştî deriyê odeya rûniştîne, di qesra raserî gund de, li dîwar spartî li benda Nûman e... Ew şerbîkê tîjî şeraba karê Êwertê, bê çawa Nûman hilgirt û anî, da ku em şahiya derketina min ji girtîgehê pîroz bikin, li benda roja pîrozbahîya serfiraziya wî û hevalên wî ye. Dema serê Nûman û hevalên wî, ji hela Kolîkê ve da der û bû xûrîna şînika çekan, di nava lîle lîle jinan de, bi dilcoşî û şahiyek mezin gundî ew

berhembêz kirin, em dê devê şerbîk vekin û bi ser xwe de bikin. Bêguman, bidestxistina azadiyê qedexeyên bi sonda emanê re hatî, ji holê radîbin û mîna ferman-darekî serfiraz, Nûman û hevalên xwe dikarin li serê banê Qesrê rûnî û li hemberî pêgiha dîr û dirêj ku ber bi qijîkê fireh dibe, vexwin. Kî dizane, belkî Sofîkê Kewa jî li wan deran bişirîfe û pal bide ser sifirîne kevîka bîn û destên xwe bixe kerîka guhên xwe û bilorîne

Hingî, zimanê 'Dengbêjê Lal' vedibe û bangawaza dîrokî ya di nava tewirandîna serspiyan de hûnandî, ku dem û dewranên dîr û dirêj di stûyê gelê kurd û asur-suryanî de bûbû lele û zincîra bendetiyê, vebike, da ku hespên şê di wê pêgiha rast de li hemberî Beriha Segvên û zeviya Kalîkê Nûman Evdellayê Zîmo de tiratê bikin. Cara yekemîn min Nûman, xortê asurî-suryanî di fotograf de dît. Ew, Matrân û Apo bûn. Ew ronahiya geş di rûdêna Nûman de bi pêkanîna gaveke dîrokî bêhîrîn geş bûbû. Cara duyemîn di wêneyên dersdarî û perwerdehiya leşkerî de ku bi zimanê filehî (suryanî) didan, dît. Simbêlê Nûman qalîn û qeytanî di ser lêva wî de pexlax bûbû û rengêkî şêrgelî dida tivêla rûyê wî. Di nava cilên gerîla de, çeprast di nava rextan de pêçayî pir bi hêbet bû. Nûman ne ew xortê berê ye ku simbêlê wî xet nû nû rast dikir bû. Xêlî û xebeta bargiraniya dîrokî û binbariya karbendiya pêşerojan ku hebûn û nebûna welatekî û gelên Mezopotamya pê ve girêdayî ye, xuya dikir. Ne hêsa ye. Ji serokatîyê heya bigihe karbendê herî nû, dest pê dike, di bin bargiraniyek dîrokî de dilerizîq. Lerizandîna dîrokî jî erdhejîna herî bilind ku 12 rade ye mezintir û diwartir e. Ji ber ku dîrokeke nû û hemdemî tî nîvîsîn. Nivîsandîna dîroka hemdemî, bi bîrdoza serpehatî û tîgihîştîne ve girêdayî ye. Bîrdoza dîroka hemdemî, pêdiviya xeml û xeyala herka

polîtîk û çandî jî dibîne. Netewetî ku wekheviya welatiyan di encameke binbarî û karbendiya dewletê (dewlet û kes hemberî hevûdin xwedî erkên pêkanînen cûreyî û pêdivî ne) nava xwe de radigire. Ya duyemîn jî, mîna îdealîzma almanan e ku piştî hûnandîna netewetî, hişmendiyek dîrokî û çandî di nava azadî û serbestiyê de bi rîkûpêk de tê lidarxistin.

Ne karekî hêsa ye. Gihîştîna qonaxa îro, pêkanîna hûnandîna leşkerî, bidestxistina maf û parastîna wî mafî, şikandîna lele û zincîrên bendetiyê, da ku komên xelkê nof bi nof di nava amadekariya xweseriyê de, di hewn û hişmendiyê dîrokî bigihîjin, hişyar bibin, her wiha gihana xewna bi hezaran-sal, azadî û serbestiya welat e. Cara duyemîn ku min Nûman dît, nofê xortên suryanî bi zimanê zîmkî jî hêla xortekî suryanî ve perwerdehiya leşkerî didîtin. Ez bi suryanî dizanim û min guh berda ser qomata wan. Dengê efser mîna dengê tîlên Mirado dihate min. Tiştêkî jî qomata leşkerî ya bi zimanê zîmkî xwestir nîn e. Ne senfoniyên Mozart, Haydîn û Çaykowskî, ne dengê Miradko û kulîna Teodarakîs... Gelo mûzîk, ne ev xweşî û dilcoşî ye ku hestên mirov aram û mest, her wiha tîgihîştî, dike ye? Nexwe, pata bi kurdî û bangawaza perwerdehî ya leşkerî bi zimanê kurdî, ne mêjiyê mirov bi tenê ezayên laşê mirov, ji dil bigirin heya bi tarişk û rîşakên ku xwîne dighînin her hêlen laş û şûnikên hûnandîna hestîyan pêk tînin, hişyar û azad dikin. Dengê leşkerî beramber azadî... Tiştêkî jî azadiyê xwestir tune be, pate û qomata bi zimanê kurdî jî, bêguman, xweş e.

Mînakê dîrokî ye Nûman. Rastî bi ser ket. Ji nava suryaniyan tenê da rê û çû, îro di nav refê gerîla de, ji gelê asurî-suryanî hene.

Ev rewş tê yek maneyê: Serketin. Navê Nûman jî serketin e.




# Embazo Rojnameger Agît, Rüştü Yorgun

**M**in û êya Îzmîr de pê silasna. Rojê çosmeyê Konak de, ez şiya dezgehê Pirtûkan ke, xo rê jew pirtûk biherîni. Wendoxî, wexto ke pirtûk herînenê, ci sero vêşî vîndenê. Min jî winî kerdê. Min jew hewadayê û jew jî ronayê, nêşayê rew rew qerar bidî ke jwerî biherîni. A roj jî min winî kerd bi ke, wayirê dezgehî min rê finê wina vat bi: "Embaz tiyê geyrenê kamcî pirtûk, ez wazena ke to rê ey bivîni." Min jî nameyê jew pirtûkî ci rê vat. No fin ey min rê vat: "No pirtûk ewro tiya de çiniyo. Ancî ek ti bişê rojna bêrê, ezo to rê hadre kirî. Ancî jî ti senî wazenê, winî biki." Çend rojî tepiya, ez şiya ke ê embazî min rê o pirtûk kerdo hadre. No pirtûk bi wesîleyê pêsilasnayîne ma. O çax embaz Agît, çepê tirkan miyan de bi.

Wexto ke ez şaristanê Îzmîr de biya, jû jû fin ez şiyê ey ra pirtûk herînayê û ma rewşê siyasetî sero qisey kerdê. O çax embaz Agît çepê tirkan miyan de giroyayê (xeftiyeyê), la belê tesîrdê lecê gerîlay bin de bî. O bi xo jî şaristanê mayê şîrîn Culemêrg ra bî. O wext a şaristan de lecî gerîlay zaf ver bi vir şiyê. Ay ra nameyê herêmê Culemêrg û lecê gerîla zaf kêf dayê ci. Ancî rojê ma rayeyina şarê xo sero qisey kerd bi. Zek yêno mi vîrî ey wina vat bi: "Bê lécî û bê çekî welat nêreyeno embaz. Ez çepên tirka miyan de giroyena la belê zerya mina welat de çekena. Zaf çiyên de qiseyê mayê nêkewnê pê ser. Ewro ez înan miyan de na, meşt jî zewbî cadê na." Embaz Agît, wextê tepya çosmeyê çepê tirkan ra abirya û şî Stenbol.

Hindê serê ravêrd bi, nêravêrd bi ke, ez jî amêbiya Stanbol. Ê rojan de ez şiyê rojnameyê Yeni Ülkey. Wija de rojê mi ewna ke, jew embazo veyn dano min. Sifta mi o nêsilasna bi. Loma min o, tim û tim erdîşin dî bi. La belê o roj erdîşa ci cikerdin bi. Wexto ke mi o nêsilasna, finê wiya û vat: "Se bi to embaz? Çi rew to ez xo vîra kerda. Min tayn pirtûkî rotê to, la belê to ez xo vîra kerda. Kê to veşaye ez Agît a, Agît." Ma na pêdiyîna dima, fina alaqqê xo viraşt. O bi bi roj-



namegerê Yeni Ülke. Kêfê ci nê karî ra zaf ameyê.

Bahdo ma piya rojname de û rojnameyê Özgür Gündem de xeftiyay. Coka jî embazîna ma vera ver şî û ma zaf çî bar kerdî. Agît ciwaneko zaf piya qelender û zaf germin bi. Mabendê ey û embazê bînan hemin jî weş bi. Ey qe nêşayê embazê xo bişikno. Wexto ke xeberan ra ageyrayê ek xo de, çiyê werdin ardê destanê xo ya kerde vila. Wexto ke ey xo de mêwe ardê, ma zanayê ke xeberê karkeranê tewlan (zerzewatrosan) viraşt. Jû fin ma ci rê vatê: "Agît to fina wayirê tewlan ra çimî arêda wo û

ardo ha! Tiyê xeberanê mêrdêkan virazenê. û pey ra jî, tewlanê ci kenê veng. Xûkê şarî ti nêdanê ma wînenê. Eke rojê rojnamegerî bîni, xeberê xûkanê to virazê, qe şaşmêbi." Nê kuşatanê ma ra zaf kêf girotê û wiyayê. pey ra jî wina vatê: "Beno beno, şima jî mewisê û mebê hetbarê (wertax) min. Ek şima bûrê, ezo jî şima gere bîkrî û ezo vajî ney, ney ney embazî ferman dayê min û min jî kerdê. Ê kê aqilîn ê, wa mewrê. Ez verî ra vana, wa xeberê şima bi bê." Embaz Agît zaf kuşetkar bi. Rew rew kesî ra nêqehiryayê. Wexto ke, tevay ra şikyayê jî, o çî çekerdê xo pîze. La belê zerî

nêgirotê û rew xo vîra kerdê.


Embaz Agît, zaf qîmet dayê embazanê xo. Ez vana jew merdim jî nêşeno ke vajo: "Ey min rê çiyê çewt vato." Loma ruhtê ey de cayê çiyê kewte çinê bi. Ez bawer kena ke, vinderdina weşîna ey de qeçekî na ci ra nata jî hindê misqalê çewî inî cinê bi. û fin vatê: "Ezo şîrî welat û bibî gerîla. Raştî jî ez rojnamegerî ra zaf kêfweş bena. Ancî no karo mi, mîrd nêkeno. Koyî, zaf mi ancenê xo. Ek-ez nêşîrî, ezo çimakerde bimanî. Dîroka ma wa koyan de yena nûsnayî." Embaz Agîtî wexto ke qalê koyan û gerîlan kerdê, riyê ci abiyayê û xorî ra wiyayê. Çimê ci zey astarok (istarele) beriqayê.

Axirî embaz Agîtî qerarê xo da û şî şaristanê Wanî. Çend rojî wija de mend, bahdo jî vejya koyan ser û bi gerîlayê reyayîne şarê Kurdistanî. Wexto ke merdimî silasnayê şino gerîla, embazanê ci wazeno ke, xebero rind ci ra bigîro. Embazanê ey jî tim û tim xeberê rindî ey ra pawitê. Ma vajê ke weşîna ci ra, xeftiyane ci ra û rûmetê şoreşgeriya ci ra xeberê rind bigîrê. Wexto ke ma ey ra xeber girotê, kêfê ma pa amayê. Loma nê xeberî ke ameyê ma rê, rûmet dayê embazanê ci. Ez vana silasnayê şoreşgeran hemin jî wazenê înan ra xeberanê ke rûmet danê bigîrê. Agîtî jî rûmet dayê ma û dayê welatê xo Kurdistanî.

Embaz Agît şaristanê Wanî dima şino başûrê Kurdistanî. Wija de hindê serê maneno. Başûrê Kurdistanê de jew qeza de dînamît destanê ci de teqeno û beno dirbetin. Na qeza de jew destê ci û kiştê riyê ci veşeno. Sifte doxtoro ke gerîla wo, wazano weş kiro, la belê rewşê dirbetinê ci giran beno, coka jî embazanê ci rişenê şaristanê Amedî. Amed de wextê tepya, beno weş û fina vejyeno koyan ser. Çend mengî dima jî na eyalet de jew lecî de menga tîrmehê de sera 1994 de şehîd kewno. Rojnameger û şoreşger embaz Agîtî mayê xo vîra nêkenê. Ez bawer a ke şarê mayo ey xq vîra nêkero û tim û tim zerya xo weş bikro.

ZÜLKÜF KIŞANAK





● 23.08.634  
Xellîyê yekemîn Ebûbekir, wefat kir.  
● 24.08.1993  
Endamê Partiya Keda Gel (HEP) Ekrem Görnû li Navenda Batmanê ji hêla Hîzbi-qontrayan ve hate qetilkirin.  
● 25.08.1071  
Fîlozof Nietzsche çû ser dilovaniya xwe.  
● 25.08.1944  
Paytexta Frensa Parîs, ji bin dagîrkeriya Naziyan xelas bû.  
● 26.08.1071  
Herba Melazgîrê dest pê kir. Bi vê herbê, bi rêberiya Alparslan kesên ji

Asyaya Navîn ku ji wan re tirk dihate gotin, ji Melazgîrê ketin nav Kurdistan û Anatoliyê.  
● 26.08.1944  
Welatê Misirê gihîste azadiya xwe.  
● 27.08.598:  
Hz. Eîf hate dinê.  
● 29.08.1995  
Nûçevanê Rojnameya Yeni Polîtîkayê Safyettin Tepe, piştî binçavkirina li Batmanê, ew birin Emniyeta Bedlîsê û li wir kuştin.

AWIR

# Ji bo HADEP'ê Şahiya Piştgiriyê



Di şahiyê de Serokê Navçeya Bağçılarê Oktay Şamiloğlu, li ser girîngiya 15'ê gelawêjê rawestiya û da zanîn ku ev roj ji bo kurdan gelekî girîng e. Di dîroka kurdan de navdartirîn roj e.

Roja 17.08.1997'an, şahiyek li ser navê "Piştgiriyê HADEP'ê bi gel re" hate lidarxistin. Di şahiya ku li HADEP'a Bağçılarê de hate lidarxistin bi giştî ciwanên kurd ên metropolan beşdar bûn. Serokê HADEP'a Stenbolê Hikmet Fidan û rêvebera bajêr Ayşe Karadağ jî di vê şahiyê de dost û hevalên xwe yê ji partiye bi tenê nehiştin.

Di şahiyê de Serokê Navçeya Bağçılarê Oktay Şamiloğlu, li ser girîngiya 15'ê gelawêjê rawestiya û da zanîn ku ev roj ji bo kurdan gelekî girîng e. Di dîroka kurdan de navdartirîn roj e. Oktay Şamiloğlu di berdewama axaftina xwe de diyar kir ku piştgiriyên bi vî rengî pêşiya gel vedikin. Ev yek ji bo xurtbûna sazîyên kurdan gelekî pêwîst û girîng e. Şamiloğlu di berdewama axaftina xwe de ji bo mêvanan wiha got: "Em bi we hene, hûn jî bi me. Em kulmeke şidandî ne. Ji bo ku em vê kulma xwe bêhtir bişidînin divê em bi hev re bimeşin." Oktay Şamiloğlu bang li gel kir û got ku divê ew bi hev re li derd û kulên xwe xwedî derkevin. Ji bo ku ew ji hev sûtê wergirin divê bi


vî awayî tevbigerin, ev tiştêkî pêwîst e. Piştî axaftina Şamiloğlu Hikmet Fidan jî li ser girîngiya şahiyên wisa axivî û da zanîn ku, di vê demê de birêxistinbûn ji bo kurdan gelekî pêwîst e. Hikmet Fidan li ser sistem û politikaya Tirkîyeyê jî rawestiya û diyar kir ku ev politîka, ji bo kesên ku li Tirkîyeyê dijîm bêxêr e. Îro em ne wekî duh in, em di gelek tiştan digihîjin. Hikmet Fidan piştî ku axaftina xwe ya li ser çete û girseyê di bin çengê dewletê de qedand, got: "Divê em xwe amadeyî her tiştî bikin. Trêna aştiyê roja 26'ê gelawêjê ji Brukselê dide rê, wê roja 29'ê gelawêjê bigihêje Stenbolê. Divê em bi coşeke mezin herin pêrgîniya trêne."

Her wiha piştî van axaftinan Koma Ehmedê Xanî ya dîlanê ku xebatê xwe li HADEP'ê didomîne bi listikên xwe reng dane şahiyê. Li aliyê din Koma Agirê Jiyan bi stranên xwe yê berê û yê nû konsereke dirêj da. Xuya bû ku gel bi vê konsera Koma Agirê jiyan gelekî kêfxweş û dilşad bû. Şahî jî aliyê hezar mirovî ve hate temaşekirin.

NAVENDA NÜÇEYAN

## ÇAVDÊRÎ

AMED TÎGRÎS



### Kurdên Kurdistanê û yên Anatoliyê

Dema ez li welat bûm, me digot qey bi tenê li Heymanayê û dora wê kurd hene. Lê dema ez derketim Ewrûpayê, bi taybetî li Almanya, ez rastî kîjan kurdî hatim got: "Ez ji Konyayê me". Ez matmayî mam.

Piştê ez hêdî hêdî hîm (hîn) bûm ku ne bi tenê li herêma Haymanayê kurd hene; her wiha li Konya, Kirşehir, Yozgat, Qeyseriyê bi kurtî li navgîna Anatoliyê lêkolîn û lêgerîn dibin. Heta kovanên taybetî derdikevin. Der heqê eşîr, gund û malbatên wan de kêm be jî, hinek meteryal kom dibin. Dîroka wan a hatina Anatoliyê hêdî hêdî ronî dibe. Mirov bi awayekî zanyarî hîn dibe ku ew berî 300-400 salan, ji Kurdistanê hatine û li Anatoliyê bi cih bûne. Ji xwe dîroka kurdan bi tevî reş û tarî ye. Ji ber ku heta niha kurdan bi destê xwe dîroka xwe nenivîsandiyê, tê de tehrîbat çêkirine. Ji derî dijminên, ew kesên ku ji ser kurdan jî nivîsandine, dîsa dijmin yê wan tehrîb û îmhâ kirine û dikin.

Ez naxwazim zêde li ser dîroka kurdên Anatoliyê ên ku niha ew ji xwe re dibêjin "kurdên surgûnê" rawestim. Ez dê di vê nivîsara xwe de piçekî behsa rewşa komeleyetî (civakî), ziman û kultura kurdên Anatoliyê bikim. Ji ber ku rewşa wan gelek balkêş û seyr e. Kurdên surgûnê ji 300-400 salî ve ne ku tûkiliyên wan ên sosyal û malbatî, ji Kurdistanê qut bûne. Lê, dîsa jî di nav tirkên de kurdayetiyê xwe parastine. Têkilî bi civata tirk re dananîne, Rabûn û rûniştina kurdan a 300-400 salî edetên wê demê di nav dil û mejiyê tirkên de parastine û heta îro anîne. Wekî prensîb bi zakokên xwe re bi tirkî deng nekirine û nakin. Kurdiya wan zelal û paqij maye. Bi tenê di dengderxistinê de guhartinek biçûk çêbûye. Di van salên dawiyê de çend gotinên tirkî jî ketine nav kurdiya wan. Ew hem li Anatoliyê û hem jî li welatên Ewrûpayê di malên xwe de bi kurdî deng dikin. Ji sedî sed nebe jî xwarin û cilên wan jî kurdî ne. Mêvantiyeke payebilind li ba wan dikin. Di van salên dawî de kurdpeweriyeke xurt di nav wan de çêbûye. Di her qad û pileyê de, bi awayekî aktîv di nav bizava azadiya rizgariya Kurdistanê de cih girtine.

Lê, di vî warî de hem li welat û hem jî li derveyî welat rewşa kurdên Kurdistanê çî ye? Mirov dikare bi gotinekê bibêje "felaket" e. Li welêt, li bajar û navçeyên mezin êdî kes bi zarokên xwe re bi kurdî napeyive. Tirkî mode ye, zimanê medeniyetê ye(!) Bi taybetî jî kurdên ku ji xwe re dibêjin 'aydîn' (rewşenbîr), zarokên wan bi kurdî nizanin. Bi tenê navên wan bi kurdî ne. Divê neyê jibîrkirin ku îro navên zarokên sosyetyên tirkên jî piranî bi kurdî ne. Wek Serdar, Serkan, Ajda, Serpil, Zerin, Dilovan... Nav ne girîng e, cewher girîng e.

Her wiha li Ewrûpayê jî, rewşa van aydinên me yê Kurdistanî wekî ya li welêt e. Kurdên me yê sosyete piranî li mala xwe bi tirkî dipeyivin. Zarokên wan bi kurdî nizanin. Modeyeke dîn jî li Ewrûpayê heye, ev jî bi taybetî li Swêdê xwe nîşan dide. Dê û bavên kurd ên sosyete û zana (!) dest pê kirine bi zarokên xwe re bi swêdî dipeyivin. Dema mirov navê zarokê dipirse, dibîne ku bi kurdî ye, lê dema pê re dipeyive, dinêre ku bi kurdî nizane, bersiva mirov bi swêdî dide. Gelo ji karakterê kurdên me yê aydin û polîtîk ên Kurdistanî yek jî xwe biçûk dîtin e.



# Nehêlin ku e

## Wê heval aştiyê bînin..!

Teyfik Atış (koçber)

Em ji ber Trêna Aştiyê gelekî kêfxweş in. Dewlet dixwaze me bixapîne, lê em êdî naxapin. Dibêje demokrasî heye, ku wisa ye bila bihêle em vegehin gundê xwe. Berî vê bi çend rojan jî 3 mebusên wan jî bo ku me bixapînin hatibûn. Eger aşti were, emê vegehin gundê xwe, ser kaniyên sar, zozan û nava fêkiyên xwe.

Mustafa Alay (koçber)

Ku aşti were, emê vegehin gundê xwe û ji yan kolanan xilas bibin. Ewên ku aştiyê qebûl nekin, ev ne misilman in, ne jî insan in.

Suna Demir (xwendevan)

Hêviya me ji Trêna Aştiyê re gelekî mezin e. Emê herin pêşiya trêne û heta ji me bê emê bikin qûrîn.

Emine Akçan (kevanî)

Kurd ji berê heta niha aştiyê dixwazin. Şêx Seîd jî aşti dixwest, rêberê îro jî aştiyê dixwazin.

Mihemed Kaya (10)

Eger ji bo aşti gav bê avêtin wê ji bo bavê min û hemû girtiyên din re efû derkeve. Ku aşti çêbe, zarokên

tirk wê baştir bijîn. Wê gavê bila zarokên tirk werin welatê me, emê jî herin welatê wan.

AMED /İHSAN UÇUR

Cemil Gül (12)

Aştî tiştêkî xweş e. Aştî hebûya minê bi kurdî bixwenda û ezê bibûma aktorê filmên kurdî...

Rojbîn Yıldız (11)

Leşkeran bavê min û çend hevalên wî li ber pêz kuştin. Min trêne nedîtiye, lê ji bo aştiyê tiştêkî baş e. Li gorî min heval wê aştiyê bînin.

Reşit Aslan (12)

Xwezî Musa Anter jî di trêne de bûya. Lewra wî jî aşti dixwest.


Emer

Bawer nakim ku tirk bîna aştiyê. Ew tim mirov dixapînin. Ez dibêjim şervan wê aştiyê bînin.

Ejder Kartal

Rêwiyên trêne bihatana, gundên şewitî bidîtana wê bizanibûna ku aşti çendî zehmet e.

Mamosta Lezgîn (29)



Zarokên boyaxvan Mehmet Kaya û Ahmet ji dîtînen xwe anîne zimên.

Belkî ev çalakiya piçêkî çavên generalan veke û wan biciniqîne.

Mela Ehmed (50)

Ji bo aştiyê fedekariyê mezin e. Lê gumana min bi, Tirkiyeyê tune ye, ew ji zarê aştiyê fêm nakin.

WAN - ELBAKÎ

## Müjdat Gezen

Ez jî wekî hemû demokratên Tirkiyeyê naxwazim li Başûrê Rojhilat xwîn birijê. Êdî tu kes naxwaze li Tirkiyeyê xwîn birijê! Ji bo ku aşti di demeke zûtîrîn de pêk were, divê em piştigiriya projeyên bi vî rengî bikin. Digel vê projeya hêja û xoşewîst divê em piştigiriya hemû projeyên



aştixwaz bikin.

Wisa dixuye ku divê mirov li hev rûnin û bi riya gotûbêjan ji bo meseleyê çareseriyê bibînin. Ji ber ku pêşiyên me gotine "Sewal bi hev bêhnkirinê, mirov bi gotûbêjê li hev dikin". Bi dîtina min, bi hevpeyvîna mirovan wê hemû pişgirî çareser bibin. Bi dîtina min ji ber ku çalakî hîna jî her alî ve pêk nehatiye, niha çapemenî bédeng e. Ji ber ku çapemenî bi berfirehî li ser Trêna Aştiyê a berî vê rawestiyabû. Ez bawer im gava ku trêne hat wê çapemenî li Haydarpaşa were pêgîniya trêne. Wekî din jî ez dikarim bibêjim wê rojnameya min (Cumhuriyet) cih bide wê bûyerê. Jixwe min jî li ser vî mijarê nivîsî. "Çapemeniya rengîn" jixwe cih nade wê bûyerê. Ez berî her tiştî hemû xebatên ji bo aştiyê baş û erênî dibînim! Ez di vî warî de naxwazim şiroveyê bikim. Ji xwe piştî ku aşti pêk hat wê aştixwazên rastîn derkevin holê. Kî aştiyê naxwaze! Ma tiştêkî wisa çêdibe... Bi nêrîna min di rewşêke wisa de ji bo pêkanîna aştiyê kurdûn an jî tirkûn ne girîng e.

Ev proje rasterast, ji bo pêkanîna aştiyê ye. Gotina min a dawî jî, hêviya min ew e ku emê li Haydarpaşa hev û din bibînin!

## Ilyas Salman

A rast min bi şeweyekî berfireh li ser vî projeyê lêkolîn nekiriye. Lê bi dîtina min hamû gav ji bo çareseriyê pişgirîka kurd girîng û hêja ne. Ez bawer im ku ev proje wê riya aştiyê ronîdar bike. Ez bi xwe jî piştigiriya vî projeyê dikim.

Li ser vî mijarê ez dixwazim mînakekê bidim; di sala 1991'ê de me hin kesên ronakbîran bi navê "Komîteya Çavdêriyê ya Başûrê Rojhilat" komîteyek damezrand. Me wê demê gelek kesên ronakbîr û hunermend vexwendin. Digel ku otobûs jî hatibûn peydakirin û gelek kesan soz dabûn jî, lê ji bilî min, Yalçın Küçük, Orhan İyiler û Bilgesu Erenus kes nehatibû.

Ji bo me hemûyan tiştêkî diyar e, li Tirkiyeyê nivîskar û hunermend ji siya xwe ditirsin. Ji ber vî yekê ez jî ronakbîran zêde tiştêkî hevî nakim.

Bi baweriyê min têkoşîna ku ji bo aştiyê tê dayîn têrî pêwîstiyê nake.

Ji bo pêkhatina aştiyê divê projeyên ku 60 milyon kesî rabikin ser piyan bîna lidarxistin. Berî her tiştî divê kesên ku xwe wekî demokrat bi navê dikin li ser vî yekê hûr û kûr biponîjin û hevkarîyê bikin. Ez jî di nav de, li ber destê ronakbîrên Tirkiyeyê tu rêçetê tune ye. Divê hemû ronakbîr bîna hev û rêçeteyêkê binivîsin.

Ez dikarim bi hêsanî bibêjim, li Tirkiyeyê hemû gel alîgirê çareseriyê aştiyê ye. Lê ji desthilatdarên Tirkiyeyê tu aştiyê naxwazin! Ji ber ku li cihanê hilberandina çekan heye û ji bo berjewendiyên hilberînerên (ûretimci) çekan jî ev her du gel pev diçin.



## Mahmut Şakar

Divê berî her tiştî ev bê ku aşti yekcar pêk nayê. Tu demdirêj divê. Ev çalakî ji bo na aştiyê gawek e.

Cudahiya vî projeyê, yek jeyê navneteweyî ye, ya jî, ji ber ku ev proje ji yê berfireh û mezintir e, bêhtir veda.

Bi taybetî ji ber ku li Almanyayê hejmara kurdan zêdetir e, pêhtir li Almanyayê deng vî çiqas raya giştî ya Ewropayê kêşeya kurd de agahdar e, pêkirina mafên mirovên li Kurdistanê reaksiyon nîşan dide yek bandoreke mezin li de nake.

Ji ber ku xebatên ji bo aştiyê zêde deng vedidin. Li Tirkiyeyê van xebatên giştî wekî propagandaya PKK'ê dike. Ev propagandaya dewletê Tirkiyeyê ye. Her wiha PKK'ê şer e, gava ku ji bo aştiyê divê kes zivêr nebe. Pêwîstiya bi vî rengî wekî tiştêkî erênî nîrxandin. Ev projeyê navneteweyî sîvil e.

Ji ber ku li herêma kurdan şer zêdetir e, li van cihan jî bo projeyê gelekî xurt û zêde. Lê, li Rojava jî piştigiriya mezin heye.

Çapemenî her dem li geolîk dixwazên xwe tevnagere. Ev ne azad e. Lê, divê çapemenî li dijî Bûyera Susurlukê helwestê divê bi heman şeweyê jî be.



# hêvî vemire!

Trêna Aştiyê ku wê roja 26'ê gelawêjê ji Brûkselê bikeve rê ji bo di roja aştiyê (1'ê rezberê) de li Amedê be, ji niha ve dengê baş veda. Li ser vê projeyê hevalên me AZAD ALTUN Û MAZLUM DOĞAN

lêpirsînek di nav kesên rewşenbîr de pêk anîn û hevalên me yê ji Kürdistanê jî dîtînen gel pirsîn. Hevalên me pirsên wekî 'ev proje dikare ji bo aştiyê çî pêk bîne, sedema bédengiya çapemeniyê, hêmanên bingehîn ên çareserîya kêşaya kurd, nîrxandinên ku vê çalakiyê wekî propagandaya PKK'ê bi nav dikin, têkoşîna ji bo aştiyê û helwesta dewletê û gelê tirk' arasteyî rewşenbîran kirin. Em bersivên wan pêşkêşî we dikin.

## Hicri İzgören

Bi dîtina min divê her kes piştgiyariya vê projeyê bike. Lewra ev proje dikare bi vî awayî bi ser bikeve.



Jixwe rewş û nêzîktêdayîna ronakbîrên Tirkîyeyê xuyaye. Ev kes şerxwaz in. Divê em ji van kesan

ji bo aştiyê zêde tişteki hêvî nekin. Jixwe rewşa çapemeniyê diyar e. Yê ku wê projeyê li ser piyan bihêlin derdorên welatparêz û demokrat in.

Bi dîtina min, nîrxandinên bi vî rengî ne di cih de ne. Bila PKK an jî rêxistineke din wê projeyê saz bike, her du jî wek hev in. Dibe ku, yê aştiyê nexwazin bibêjin ev propagandaya PKK'ê ye. Lê, çî dibe bila bibe, divê her kes piştgiyariya vê projeyê bike.

Her çiqas niha li Amedê bédengiyek hebe jî, dema ku trenê gihîştê Amedê wê gelê Amedê bi dilgermî û çêşê mezînan here pêrgîniya Trêna Aştiyê. Dîsa wekî her carê mirov li qad û kolanan hilnayên. Bêriya gei a ji bo aştî û azadiyê geleki xurt û kûr e.

## Koray Düzgören

Projeyên bi vî rengî sembolîk in û rasterast tesîrê li çareseriyê nakin. Ew ji bo daxwazê navneteweyî û wijdanê raya giştî navgînek e.

Sedema bédengiya çapemeniyê ev e, bi awayekî baş nehate bihîştin. Em jî dereng pê hesiyar. Divê danasîna wê projeyê bêhtir bê kirin. Bi dîtina min danasîna projeyê baş nehat sazîkirin. Ji ber ku digel hatina trenê nêzîk bûye hîna jî çapemeniyê cih nedaye wê projeyê.

Li Tirkîyeyê gava ku aştî hat rojevê siyasetmedar bawerîya xwe bi mirovên sîvîl naynin. Dîsa, wekî her car

siyasetmedar dibêjin: "Ku aştî pêwîst e wê jî emê binin." Ji ber wê nêzîktêdayîna, ev projeyê wekî propaganda PKK'ê tê binavkirin û dixwazin mehkûm bikin. Ji bilî xwe bawerîya xwe bi kesî neymin.

Dibe ku PKK jî propagandaya aştiyê bike. Lê, ev tişteki siruştî ye. PKK jî ev 14 sal e ser dike. Ew jî peritî û westiya. Ji ber ku ew jî ji mirovan



pêk tê. Aligir û dilxwazên wê jî daxwaza aştiyê tînin zimên. Lê ji ber ku PKK daxwaza aştiyê tîne zimên, ev nayê wê wateyê ku divê rêxistin û mirovên vî welatî heman dîtînan neymin zimên. Ev nêzîktêdayîna bê wate ye.

Bi dîtina min têkoşîna ji bo aştiyê tîr nake. Ji ber ku mixabin li Tirkîyeyê têkoşîna ji bo aştiyê bi tenê wekî karê kurdan tê dîtînan. Navê "Musa Anter" li trenê hatiye kirin. Ev biryar di cih de ye. Ji ber ku Musa Anter filozofekî me û aştîxwazekî jî dil bû. Divê her kes piştgiyariya wê projeyê bike. Ji ber ku enflasyon û têkçûna aborî girêdayî şer e. Divê em gel di vî warî de agahdar bikin. Lê, sed mixabin, kesên ku diviyabû piştgiyariya wê projeyê bikin xwe nedan pêş.

Bi nerîna min, bi piranî daxwaza mirovên normal aştî ye, ji ber ku mirov gava ku zarokên xwe dişînin lêşkeriyê, xeman dixwin û dudil in. Lê, divê ev daxwaz ji bo aştiyê bê birêxistin.


Dîtînen Ecevit ên li ser kêşeya kurd bêbingeh in û durtî rastiyê ne. Bi nêzîktêdayîna wî, kêşeya kurdî çareser nabe. Divê di navbera Rojhilat û Rojava de pîrek bê avakirin. Lê Ecevit nikare wê yekê pêk bîne.

Yek jî divê em di vî warî de ji desthilatdarên Tirkîyeyê zêde tişteki hêvî nekin. Her dem jî peyva "aştî" ye tirsîyane. Jixwe ji ber wê yekê naybera Tirkîyeyê û cîranên wê ne baş e. Li Tirkîyeyê sistema me mîlîtarîst e. Wê yekê bandora xwe li ser medya û civakê jî kiriye.

Partiyên siyasî wê li gorî helwesta dewletê tevbigerin. Jixwe wezaretê karên derveyî jî helwesta xwe diyar kir û yekser wekî hemû projeyên navneteweyî got: "Ev propagandaya PKK'ê ye." Di vî warî de geleki lezgin e. Ji ber ku Tirkîyeyê di qada navneteweyî de nikare li dijî PKK'ê tişteki bike û rewşa wê jî ne mûsaft e. Dest avêtîye lomanîne. Ji bo vegotîne tişteki zêde nabîne. Li ser wê yekê hemû projeyan wekî propagandaya PKK'ê dilomîne.

aştiyê jî tevbigere. Ji ber ku azadiya çapemeniyê jî girêdayî wê yekê ye. Hin derdorên ku helwesteke erênî nîşan nadin hene.

Ji ber ku di wê serdemê de nemaze bi diyarbûna "Büyera-Susurlukê" bê watebûna şer ji berê



bêhtir diyar bû. Ji bo pêkanîna aştiyê hin derfetên siruştî (tebî) peyda bûn. Ji ber van rûdanan daxwazên ji bo aştî û demokrasîyê fireh û xurtir bûn. Her wiha hikûmeteke nû hat damezîrandin, ev jî derfetek e.

Bi taybetî piştgiyariya partiyên li derveyî parlamentoyê, xurt û zêde ye. Lê heman tişt jî bo partiyên di nav parlamentoyê de ne rast e. Deniz Baykal ji bo projeyê piştgiyariya xwe ragihand. Jixwe wê parlamantoyê heya îro ji bo aştî û demokrasîyê tu gavên hêja û bingehîn neavêtine.

Heya îro em li tu çewsandin û zordariyên tund rast nehatin. Hêviya me ew e ku, ev nêzîktêdayîna di dema hatina trenê de jî berdeham bike.

## Haluk Gerger

Ev proje berî her tiştî li dijî hêzên şerxwaz çewsandineke sincî (ehlaqî) ye. Her wiha nîşaneyên piştgiyariya navneteweyî ya ji bo hêzên aştîxwaz û gelê kurd e. Ji ber wê piştgiyariya navneteweyî ev proje xwedî bandoreke erênî û girîng e. Bi wê projeyê wê ji bo xwe îfadekirina siyasî ya gelê kurd, hin derfetê pêk bînin. Ji ber wê yekê wê ev proje dilê gelê kurd û dostên wî geş bike. Trêna Aştiyê wê rûyê qirêjî yê hezên şerxwaz nîşanî raya giştî ya cîhanê bide.

Digel ku li Tirkîyeyê çapemenî wekî hêzeke pîr-alî û demokratîk xuya dike jî, di bingeha xwe de berdevkê mîlîtarîzm, derewkarî û qirêjîyê ye. Ji ber wê yekê divê helwesta medyayê wekî rûdanekê normal bê nîrxandin. Medya gava ku nikare rastîyan beravajî dike, bédeng dimîne û bi vî awayî rastîyan dikuje. Her wiha helwestê girtina ronakbîrên Tirkîyeyê jî tişteki şermane ye. Digel ku di qada navneteweyî de piştgiyariyekî girseyî û xurt heye, li Tirkîyeyê ev piştgirî geleki qels û lawaz e. Jixwe li Tirkîyeyê ronakbîr bi piranî ji ber ku piştgiyariya şerê psikolojîk dikin ji rûmeta xwe bûne û ji ber tirs û berjewendiyên xwe dibin hevparên sûcên li dijî gelê kurd û kedkaran. Ev yek bi wê projeya aştiyê careke din derket holê, ji ber van egeran mirov nikare van kesên reben wekî ronakbîr bi nav bike.

Me her dem anîye zimên. Divê aliyên şer li hev rûnin. Ji bo biratiya gelan û aştîyêke bi rûmet hev dîtînan

çêbikin. Heke ku ev ne mimkûn bê pêşniyaza me ji bo çareseriyêke siyasî û programeke demokratîk e. Girêdayî wê yekê divê agirbestê ragihandin. Piştî wê yekê ji bo herkesî û bi taybetî jîbo ku gelê kurd bi rêxistinên xwe yê siyasî xebatan bike, divê mercên gotubêjên azad be pêkanîn.

Heke ku PKK propagandaya aştiyê bike jî ev ne etîstekî ku mirov jê zivêr bibe ye.

Rejimê îro xwe ji bo şer saz kiriye. Gelê Tirkîyeyê jî hê pê nehe-



siyaye ku belengaziya wî ji ber şer pêk hatiye. Ji ber wê yekê girîngiya aştiyê bi şeweyekî baş fêhm nekirîye. Kesayatiya, rejimê jî nîşka wê naguhere, lê wê hêzên gelêrî hişyar bin û li dijî şer têbikoşin. Ku kedkarên tirk xwe ji şovenîzmê bifiliştînin û li berjewendiyên xwe yê çînayetî xwedî derkevin, biratiya gelê tirk û kurd wê pêk were.



**Helbestvanê materyalizma mîstîk**

**Edonîs**

**H**elbestvanê navdar ê ereb Edonîs (Elî Ehmed Saîd) piştî ku "xelata Helbestê ya Nazîm Hikmet" wergirt, li Kurdistanê û Tirkîyeyê jî di rojeya hunerperweran de cihê xwe girt.

Edonîs, di 1 rêbendana 1930'î li Suriyê hatiye dinyayê. Heya 10 saliya xwe li gundê xwe jiyaye. Xwe bi xwe hînî xwendin û nivîsandinê bû û Quran xetm kir. Helbestên kevînarê yê erebî bi taybetî yê Ebu Tammam yê ku di sedsala 9'an de jiyaye, xwendin.

Di helbestên Edonîs de taybetmendîya ku xwe dide pêş mîstîzmeke materyalist e. Di helbestên wî de hewla xwe gihandina yezdan tune ye. Li cem wî "yekîtiya her du cihanan" rast e.

Jiyana Edonîs, çîrokên filman tîne bîra mirov. Piştî ku Suriyê di sala 1944'an serxwabûna xwe bi dest dixwe, Serokomarê yekemîn Şukrî El-Kuevvetî dest bi geşteke (ger) giştî dîke. Gava ku Elî Ehmed bi ve yekê dihesse, jî bavê xwe re dibêje: "Ezê ji serokomar re helbestekê bixwînim." Bavê wî jî wiha bersivê dide: "Lawo tu kî yî! Tuyê çawa li pêşberî serokomar bipeyivî!" Lê Elî Ehmed, helbest, nivîsand û li pêşberî hezaran ji serokomarê re xwend. Piştî vê helbestê, Serokomar Şukrî El-Kuevvetî jî şûna xwe rabû û eniya Ali Ahmed ramûsand. Serokomar jî Elî Ehmed daxwaza wî pirsî. Wî jî got: "Ez dixwazim bixwînim." Hefteyekê bi şûn de jî serokomar ji bo Alî Ehmed nameyek şand û ew li Tartûsê li lîseyê bi cih kir. Ehmed li vir sê salan xwend û derbasî Latakia bû û fêrgeha (dibistan) 12 salî di nav 5 salan de qedand.

Elî Ehmed, cara pêşin li Latakia dest bi xebatên ramiyarî (siyasî) kir. Li dijî hezên mayî yê fransî çalakî û xwepêşandan dan saz kirin. Helbestên wî cara yekem di vê serdemê de hatin weşandin. Li sala 1950'î li Zanîngeha Şamê dest bi xwendekariyê kir. Elî Ehmed wê serdemê jî rexne li şewaz û naveroka helbesta erebî digirtin. Wî di nav wê şewazê dû naverok wekî dil didit. Helbestvanê ereb, ev dîtin û nêzîkê dayînên xwe di pirtûka xwe ya bi navê "Li bo helbesta ereb destpêk" de anî zimên.

Elî Ehmed, piştî ku zanîngeh qedand li ser "Mîstîzma ereba" master kir. Di sala 1956 de, bi Halide Salih re zewicî. Salih îro di nav girîngtîrîn rexnerên ereb de tê jimartin. Elî Ehmed Piştî vê zewacê çû Lûbnanê û navê Edonîs li xwe kir. Edonîs di mitolojiya gelek şaristanan de "Yezda-



nê Nêritiyê" ye. Edonîs, ji bo Elî Ehmed, nîşaneyê vejîn, guherin û li nasnameya xwe gerîn e.

Edonîs, li Lubnanê bi helbestvanê lûbnanî Yusuf El-Hal ve kovara "Şiir" derxist. Vê kovarê di warê şewaz û naverokê de, di helbesta erebî de şoreş pêk anî. Helbestvanê herî girîng û navdar ji bo vê kovarê nîşan.

Edonîs, li salên 1960 û 1961'ê li Parîsê ma. Piştî vegeriya Lûbnanê bû welatîyê vî welatî. Piştî çend salan jî ji kovara "Şiir" veqetiya.

Piştî ku di sala 1968'an de hevîyên wî yê wêjeyî têr gihîştin, bi navê "Mawaqîf" (Helwest) dest bi weşandina kovarekê kir. Ev kovar îro, jî, ji bo xwedêbirina ronakbîrên ereb warekî serbixwe û cihê reng e.

Edonîs ev demek e li Parîsê dijî û endamê Akademiya Mallarmê ye. Helbestvan, di sala 1971 xelata "Syria -Lebanen of the International poetry forum" û ji girîngtîrîn xelatên helbestê, xelata "Le grand Prix des Biennales Internationales de Poesie" (Bruksel) wergirt. Helbest û nivîstinên wî li welatên wekî Fransa, Îngiltere, Belçî-

ka, DYA, Îspanya, Norwêç, Îsveç, Japonya û li Yekîtiya Dewletên Serbixwe hatin weşandin.

*Rû ji jiyane re tune  
Jiyan bi deng e*

*Pencere çavê malê ye  
Malek ji aso re*

*Di toza rê de em dixwînin  
Tiştê ku em nîzanin binivîsin*

*Ronî kiraseke  
Dibe carna ro li xwe ke*

*Ba ji pêrî xweliyê naçine  
Û kar dîke ji bilî gul nenasî*

*Neqsa wêne kêş dîkî  
Lê wî perçe dîkî*

*Pûş bi paleya çinîne kenî  
Lê kevzî bi cejna xwe pîroz dibe*

*Ez te pîroz dikim wa qûm  
Tu tenê karî  
Avê û leylandê birêjîni di tasîkê de  
Waletek nasnama wî dûman e*

*Ba evîndarekî bi tenê ye  
Ba bi agir re radizê  
Di kirasekî de*

*Nama gulê behna wê ye  
Awaza digihîne me*

*Kevir kaniyê difetisîne  
Kanî kevîr hambêz dîke*

*Kar roj e şev jê'r tune ye  
Bîranîn şev e, roj jê'r tune ye*

*Derya daristanekê dikî sema  
Ewr daristanekê zikişkê dîke*

*Pêl gîtar e... têlê wê perav in*

*Çivîk nastirên... di zeviyên bêdengiyê  
nas nakin*

*Ronî baweriya sîkê ye  
Sîk bê baweriya roniyê ye*

*Komek dîrokê dinivîse  
Kesek dixwîne*

*Zarok bi demê re dilîze  
Kal xwe dispêrê*

*Ziman zingar digire ji gotinên pir  
Û çav zingar digire ji kêmbûna*

xewnan

*Qermîçok xêzîk in di rû de  
Gok in di dil de*

*Deryê xwe girt  
Ne ji bo kêfa xwe têxe benda  
Lê ji bo kulên xwe rizgar ke*

*Rok timî li pêşiya me ye  
Bêyî ku bilive  
Ronî nikare xew ke  
Ku qemîsê tariyê li xwe neke*

*Xêzka rast... di evîne de  
Giroverek e*

*Dar jinaniya ba ye*

*Perav balîf e  
Pêl pala xwe didê  
Gava ji xwendina derya diweste*


*Sor bi tena xwe  
Zane çawa tacek be ji gulan re*

*Roj bi destê xwe dibîne  
Û şev bi laşê xwe giştî*

*Siya gulê  
Guleke dina çilmisandî ye*

WERGERA HELBESTAN: ÎSMAÎL KOSE





Li navendên çandê çalakiyên vê hefteyê  
Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê  
● 24.08.1997 Yekşem:

Konsera Koma Agirê Zerdeşt, saet:14 :30  
NÇM-Yekîtiya Malbatan: "Hin mînak ji xwarinên kurdan"  
Dilana Koma Gulên Mezraban, saet:18:00  
saet: 18:00

Li NÇM'ya İzmirê  
● 24.08.1997 Yekşem:

Mîzansen û lîstikên gelêrî, Koma Kendal, . Saet:18:30

● 29.08.1997 Fr:

Konsera Koma Çiya, saet:19:00

Li Emek Kûltûr Merkezî pêşangeha wêneyan a Sûleyman Özkan û Ali  
Özkaplan heta 30'ê gelawêjê dom dike.

Li Mine Sanat Galerisi, 10 Hünermend-10 Berhem heta 30'ê gela-  
wêjê dom dike.

Li Doku Sanat Galerisi pêşangeha wêneyan a ji her cureyî heta 2'yê  
rezberê dom dike.

## AWIR

# Televîzyona kurdî bi roj jî bi me re ye

**MED**-TV dest bi weşana xweya nû kir. Ji vir û pê de saet ji 8'ê sibehê hetanî 13.00'an beşa yekemîn a weşanê hebe, piştî vê saetê heta 17'an wê weşana radyoyê hebe, ji 17'an heta 1'ê jî beşa duyemîn ya weşanê wê hebe. Ligel gelek pirsgerêk û astengan televîzyona gelê kurdî bi pir-dengî û pir-rengiya xwe ya çandî û hunerî li ber xwe dide û bi proseyên nû derdikeve pêşiya temaşevanên xwe.

MED-TV roj bi roj xwe bi qalîtetir dike. Di warê nûçe, siyaset, şîrove, huner û muzîkê de gavên mezin diavêje. Dikeve mîjîyê pîr û kalên me, dibe hêviya zar û zêçên ji cihanê haydar. Gelê Kurdistanê parçe parçe ber bi hev tîne. Ji bo kurdan xala herî girîng, di warê

yekgirtina zimên de, pêşiya xebatê vedike.

Berspirsê MED-TV'yê jî yê ku em pê re axivîn di vî warî de heman dîtin anîn zimên. Berpirsekî MED-TV'yê dide zanîn ku kadroyên wan digîhîjin û berdeham dike: "Hedefên me yê mezin hene. Di weşana nû de wê gelek kêmasî ji holê rabin. Êdî ev du sal û nivê MED-TV ligel hemû astengan weşana xwe didomîne. Niha gelek proje di destê me de hene. Bi giştî emê li gorî daxwazên gelê xwe weşana xwe bikin. A niha di weşana nû de 4 saet radyo heye, di nav armanca me ya yekemîn de piştî 1'ê rezberê emê weşana televîzyona MED-TV derxin 17 saetan."

Belê berspirsê MED-TV'yê dide zanîn ku di weşana nû de bernameyên nû

*Dayê rondik tîn ji çavan wekî kanî  
Derdora min girtin hin çav û biyanan  
Xwinxwar û birakujî kirin bi nezani  
Lê çî bikim dayê, neyar ez kuştim.*

*Di ser min re roj, berê min li welat  
Êdî ne xewn e, ew xeml û xelat  
Welatekî serbixwe, kurdê tim azad  
Dilşad be dayê, vaye ew roj hat.*

14.04.1997'an de li Sasonê, Xerîb DİLEK (Ciwan)  
û çar hevalên xwe gihîştine şehadê. Di şexsiyeta  
Xerîb DİLEK û hevalên wî de ez şehîdê azadiyê bi tevahî bibir tînim.


Li ser navê çend hevalên wî Mehmet İMIŞÇI




XERÎB DİLEK (CIWAN)

## TÎŞK

SÎRWAN REHÎM



Nivîsa nivîskarê me  
negihîşte destê me.



Ji bo agahdarkirina gel hene û navê hin bernameyan wekî mînak bi rêz dike. Dîroka civakê; civaka koledar, kapîtalîst û sosyalişt, Dîroka cihanê û yê Kurdistanê li ser çand û destanan. Edebiyat, huner, dîroka şoreşê, welatparêzî, dîroka olan (dîn) wê ji aliyê 50 mamosteyî ve piştî 1'ê rezberê bê dayin. Berspirsê MED-TV'yê dide zanîn ku wê ev ders hem bi kurdî û hem bi tirkî û bi zaravayên dimilkî û soranî wê bê dayin. Li ser pîrsa me berspirsê MED-TV'yê der barê rexneyên temaşevanan de diyar kir ku, bi giştî rexne li ser ziman tîn. Pişt re da xuyakirin ku ji ber mercên taybet ên Kurdistanê zimanê MED-TV'yê bi awayekî tîkûz rûneniştîye.

Berspirsê televîzyona Med, daxuyand ku ji nav gel kêr rexne tîn ji ber ku gel jî di warê ziman de kêr agahdar

e. Lê zimanzan û ronakbîrên kurd an jî derdorên ku li ser zimên xebatê dikin bi giştî zimanê MED-TV'yê rexne dikin. Belê niha hin ji bo zimanê MED-TV giran, hin jî sivik dibêjin.

Berspirsê MED-TV dide xuyan ku, ji bo yekgirtina ziman ketine nav xebateke kûr û dirêj. Berspirsê MED-TV'yê di dawîya axaftina xwe de diyar kir ku, êrişên li dijî MED TV'yê pir tecrube dan wan. Gelê kurd, li wan, xwedî derketiye. Li televîzyona kurdî temaşe kirine. Berspirsê navborî ev helwesta gelê kurd wekî fedakariyê gelekî mezin bi nav kir. Berspirsê MED-TV axaftina xwe wiha qedand: "Emê jî laîqî gelê xwe bin. Ev televîzyon çekek e di destê me de. İmkanên ji bo bikaranîna wê çekê jî ji her demê bêhtirin."

NAVENDA NÜÇEYAN



# Çayxaneyaya karkaren

**W**eyşî hîn ku berbang nehilatî hişyar bû. Dest û rûyê xwe şuştin, çû ji dikanê ji bo taştê nan, sed qiram penîrê bêîman û sanayağiyek kirî. Dilekî wî got zeytûna jî bistîne, lê dizanî ku hevalên wî ji wan hez nakin, dev jê berda. Weysî taştê stand û vege-riya qawîşê. Ava çayê danî ser ocaxê. Nihêrt ku gaza tûp pir kêmbûye. Çû qawîşa kêlekê tûpek anî, ava çayê danî ser. Dû re dêl li hevalên xwe kir, ew ji xew hişyar kirin.

Hevalên Weysî; Hesên, Nezir û Emer jî ji xew hişyar bûn. Wan jî dest û rûyê xwe şuştin û li ser sofrâ rastkirî rûnistin. Dema giş ji ser sifrê rabûn Weysî li saeta xwe nihêrt, saet dihat heftan. Ji bo karkeran li vir ne semî û yeksem hebû, saet heft tê maneya guh-darkirina radyo ya BCC. Radyoyê di nav nûçeyên xwe de qala qewimînên li Tirkîyeyê dikir, Weysî xwe negirt.

– Berê xeberên BCC ji yê dewleta tirk cuda bûn. Niha ew jî hema bêje du-bareya yê wan in.

Karkerên din jî bi serê xwe gotina wî rast kirin.

Weysî xortekî hivdeh salî bû. Bejn-zirav û dirêj bû. Esmer û porê wî gustî-lî (xêlekî) bû. Weysî pir guh nedida ser û cilên xwe, tim dikenî lê di bin kenê wî jî de melûliyek, xemgîniyek hebû. Lîse dixwend. Li derveyî dibistanê jî xwe baş gihandibû. Tu çaran bi gotinên mamosteyên xwe têr nedibû; heta gelek çaran ew şaş didîtin û bi wan re nîqaş dikir. Di piraniya nîqaşan de jî mafdar derdiket. Ne tenê bi mamosteyên xwe re; bi her kesê ku li hemberî doza neteweyî bû re. Bêsekin, bêwestan.

Wextê roj qamekî bilind bû, tev karker li Çayxaneyaya Karkeran peyde bûn. Karkerên însaatê yê li vir giş kurd in. Torî ne, botî ne, serhedî ne ... û hin ji kurdên şexbîzîne ne ku sêsed –çar sed salî berî niha koçberî vir bûne. Hin zarok in; sêzdeh, çardeh salî ne, hin şêst heftê salî ne. Berî niha karkeran hundi-rê çayxaneyê tijî nedikirin, lê niha rîya wan li ber devê çayxaneyê jî nemaye. Kêmbûna çaran ji xelkê vir, hin dipekin çay-xaneyaya karkeran. Yek ji wan Apê Gêncî ye. Apê Gêncî pênçî-şêst salî ye. Porê wî spî bûye. Bejn qut û bigoşt e. Apê Gêncî tim tê Çayxaneyaya Karke-ran. Bi wan re rûdine, xeber dide. Apê Gêncî wekî pir kesên din xwe ji karke-ran cuda nabîne. Halê wî jî xweş e (aborîya wî), lê nefsbîçûk e.

Weysî hîn taze ji welat hatibû. Dema hate çayxaneyê gelek hevalên wî bixêrhatin danê. Weysî pir bi heyecan bû; hela li dora xwe dinêrî. Çavê xwe li ser maseyan digerand, digot ka kî zêde bûye, kî kêmbûye, çî guherîye, çî ne-guherîye. Ya zêdebûnê çend kes zêde



bûne, lê ya guhertinê tiştê neguherîye. Dîsa çayxane eynî çayxane ye û çayxaneyan jî eynî kes e; Rifatê çayxaneyan. Rifatê reşîk Rifatê mirûzkirî, Rifatê pozbilind, Rifatê zarhişk. Mal û milêkê xwe li ser piştê karkeran kar kiriye, lê buhayê pîvazekê nade karkeran. Çayê bi kotekî dide karkeran, tahl xeber dide, zirtan dike. Nahêlê ku piyê etaran bi çayxaneyê bikeve. Ku hevalekî wî tê ji wan re dibe fêrîsteh. Kursiyê jî bin karkeran radike, dide bin hevalên xwe.

Weysî dema Apê Gêncî li ser maseyê dît ji hevalên xwe qetiya, çû balê. Apê Gêncî ji Weysî re cih çêkir, bixêrhatin dayê û jê re çayek xwest, pê re pîrsa welêt ji Weysî kir:

– Êê, Weysî tu taze ji welat hatî; çî hebû, çî nîn bû li welat?

– Wele hewa pir germ bû Apo.

– Erê, vêga li Tirkîyeyê cihê herî germ ew aliyê we ye. Bi zahfî Batman.

– Na Apo, ez qala hewa sîyasî dikim. Qala şer, kuştinê dikim. Her roj bi dehan mirov tîn kuştin. Heta niha çend gund hatine şewitandin an valakirin hûn dizanin?

– Na.

– Ser sê hezarî. Her roj li cihêkî bombeyek, mayinek diteqe, zarokek, jin, şivan dimirin. Roj bi roj mirov jî

aliyê dawletê ve tîn revandin. Tu serî li kê bixî bersiv tune. Rojekê cendekê wî yê îşkencekirî; destşikandî guhjêkirî, yan jî serjêkirî li ber çemekî yan jî li ber riyekê tê ditin. Tu kes nikare hesab bipirse û tu kes jî hesab nade.

– Lawo, ev kî van dibêje? Em pê nahesin. Ma ne terorîst van qewmînan dikin?

– Te got kî van dibêje?

– Erê.

– Tu kes nabêje Apo. Em bi xwe dibînin, dibihîzin, em bixwe dijîn. Û van tiştan jî dewlet dike.

– Lê televîzyon ne wisa dibêjin?

– Apo, ma televîzyon wê çawa bibêjin. Televîzyon, rojname, ev gişk di bin siya dewletê de ne. Ha dewlet ha çapemenî, ha çapemenî ha dewlet. Ma kî dibêje “dewê me tirş e.” Ez ji te re dibêjim em bi xwe dijîn.

– Lawo, hema kî bê kuştin û kî bikuje jî şer ne başe, pevçûn ne baş e. Hûn xwe dûrî wan bigirin. Xwendina xwe bikin û bibîne pêşîvan ji vî miletî re. Tu çaran jî ji rîya heqiyê dernekevin.

Karkeran ku karê wan hebû, çûne karê xwe. Hindek karker jî betal mabûn. Yê ku karê wan hebû dilşahiyeke li ser rûyê wan bû, yê betal melûliyek; dilzîziyek. Hin karker li ser piyan bûn û

hindek jî li dor maseyan rûniştibûn. Bêdeng û bêlebat. Tenê maseya ku deng jê dihat, maseya Cemalê Etar bû.

Weysî destûr ji Apê Gêncî xwest û bi dilekî şikestî çû li ser maseya Cemalê Etar rûnişt. Cemalê Etar dîsa wekî her carê tiştên etariyê difirotin, pê re jî gelek henek dikirin. Çend ciwan li dora wî kom bûbûn û pê re tişt û mişt bazar dikirin. Nedikirin jî, lê tiştê wî tevlihev dikirin.

Hêngî xebirdana wî xweş bû, tu çaran dora wî vala nedima. Li ser hev diçû Nisêbinê û dihat. Her cara ku diçû Nisêbinê bi xwe re tişt û mişt û meseleyên nû dianin. Ji çaya qaçax bigire heta titûnê, radyo û teybên biçûk, saetan.... Karkeran titûn û çaya qaçax pir distandin. Jixwe ji pêşî de ev her du nîşanên karkerên însaatê ne.

Ciwanê ku simbelên wî diketin devê wî jî dema ku cixare dipêça ji Cemal pirsî:

– Cemal, de ka bêje lo çî li Nisêbinê hebû?

Cemal bêyî ku bihizire, qurta dawî li çaya xwe xist û dest bi bersivandina pîrsê kir:

– Heval, li Nisêbinê êdî şeytanok hew wekî berê diwêrin kuştinê bikin. Ziravê nava wan qetiyaye. Gelê me yê wir-hew wekî berê çîma xwe bi wan tîne. Wê roja ku ezê bêm, dîsa sê şeytanok mirovekî bi navê Hecî Şemso di dikana wî de dikujîn û derdikevin, hêdî hêdî meşa xwe xera nakin, diçin.

Weysî:

– Tu kes dengê xwe nake?

– Çawa heval. Dikandarê cîranê wî derdikeve, dinêre ku Hecî Şemso kuştinê. Hema hêrsa xwe diqire, xeberina dibêje û dide pey wan. Dikandarê din jî ku wî dibînin ew jî bi wî re didin pey wan. Her kesê ku dibihîzê ew jî tevli dikandaran didin pey wan. Şeytanok dibezin, lê ma mîlet disekine? Ew jî li pey wan. Her sê şeytanok bi derekê de dibezin lê ji destê mîlet nafilitin. Axirê du heb tîn kuştin, yek birîndar difilite.

Weysî:

– Helal be ji wan re.

Ciwanê ku simbelên wî diketin devê wî:

– Ez qurbanî wan bim. Ji eşqa, kiloyek çay ji Cemal kirî. Çaya wan jî hebû. Cemalê Etar wexta gotina xwe qedand rabû çû karê xwe. Ciwanê dora wî jî rabûn. Di rûyê wan de şahiyek hebû. Weysî ber bi qawîşê de meşî. Wextê giha qawîşê negiha, çayek danî ser ocaxê. Bi kêf cixareyek pêça û ponijî. Çawa ew xeberên xweş wisa diçin û tîn ji welêt. Hîn rojek bûbû ku ji welêt hatibû, lê dîsa welat di bîra wî de bû.



# Kovara Lêkolîn û Lêgerînê 'War'

Kovara ku wê bi zimanê tirkî û zaravayên kurdî, kurmançî û kirdkî (kirmançkî) weşanê bike, hejmara xwe ya yekemîn a havînê derxist. Kovara ku wê ji 3 mehan carekê derkeve pêşberî xwendevanan, ji 144 rûpelan pêk hatiye. Ev kovar, ji hêla Şirketa Kor we hatîye weşandin. Di kunyeya kovarê de Kamber Soyupak wekî xwedî û berpirsiyarê karên nivîs-

re buhayê kovarê milyonek e. Di mercên îro de, piraniya kesên kurd nikarin rojnameyê rojane bikirin û bixwînin, milyonek ji bo kovarekê bi rastî jî gelek zêde ye.

Em werin ser naveroka kovarê... Di vê hejmarê de, Remezan Alan li ser Mem û Zînê nivîsarek nivîsiye. Di nivîsarê de pirtûka klasîk a Mem û Zînê, bi şeweyê hûrbînî û bi çaveke nixandîni jî nû ve tê honandin.

Lêkolîvan û nivîskar İsmail Göldaş, di serhildana Qoçgiri de du şexsiyetên kurd bi navê "Sakallı Nurettin Paşa û Ebubekir Hazım Bey" ku alîkarî û piştgiriyeke xurt dane komara tirk, tevî nêzîktêdayîna wan a li hemberî gelê kurd dinirxîne. Her wiha meqaleya Ali Emirî, ku fetha tirkan a Diyarbekirê hildaye dest, Ji hêla Abdurrahman Uçaman ve ji zimanê Osmanî li tirkî hatiye wergerandin. Di meqaleya xwe de A. Ali, cih û girîngiya zimanê kurdî, di nav zimanên cihanê de radixe ber çavan.

Li hêla din du zarava û du devokên kurdî (kurmançî, dimilî, hewremanî û senendecî) bi şeweyêke rûberîni û alfabetîk, S. Verroj û A. Uçaman hildane dest. Di vê hejmarê de bi tenê hevokên ku bi tipên 'A' û 'B' yê dest pê dikin, tene nixandînin.

Çawa ku di vê hejmarê de hatiye honandin, di hejmarên pêşerojê de jî, saziyên civakî wekî diwan, medrese... wê ji bo kovarê bibin mijar. Di vê hejmarê de Xoceyê Xasî jî hatiye nasandin û tê gotin ku nasandina şexsiyetên kurd wê di hejmarên din de jî bidomin. Dîsa ji hêla Seîd Verroj ve li ser "Folklorê kurdî" nivîseke hêja hatiye weşandin. Di vê nivîsê stranên folklorîk ên kurmançî û dimilî radiweste. Di vê nivîsê de li ser jî hev veneqetandina kurmançî û dimilî wekî kêmasiyekê balê dikişîne.

Navnîşan:  
Kazım İsmail Gurkan cd.  
Hamam sok. Yavuz Han  
No:2 kat: 3/3 Cağaloğlu / İST  
Tel:(0212) 522 21 02

SALIHÊ KEVIRBIRÎ

# Takrir-î Sükûn Görüşmeleri

Pirtûka lêkolîner û nivîskar İsmail Göldaş bi navê "Takrir-î Sükûn Görüşmeleri (Hevdtînen Takrir-î Sükûn)" di nava Weşanên Belgeyê de derket. Pirtûka ku ji 512 rûpelan pêk tê, bi giştî li ser hilbijartinên 1923, meclisa tayînkirinê û rûdanên piştî wê demê disekine. İsmail Göldaş, di vê pirtûka xwe ya nû de, bi perspektîfeke cihêreng li salên 1920'an dinihêre û di xebatên damezirandina komarê de, astengên ku li hemberî muxalifan dihatin organizekirin, radigihîne. Her wiha di pirtûkê de, "Danişînên meclisê yê veşarî" ku heta niha nehatine weşandin ku wê rê ji xebat û niqaşên nû re ve bike, cihekî girîng digire.



Pirtûk ji 7 beşan pêk tê: "Hilbijartinên 1923'an", "Birêvebirina hilbijartinê", "Hilbijartinên 1923'an û çepgir; TKP, TİCSF", "Rêxistinên karkeran", "Avakirina TBMM ya dîyemîn û karakterên siyasî", "Hevdtînen Takrir-î Sükûn",

"Hevdtînen dîyemîn ên danişînê" û "Kesên ku zagon pejirandine" sernavên mijarên pirtûkê ne.

Nivîskar İsmail Göldaş di sala 1950'î de li Erdîşa Wanê hatiye dinyayê. Perwerdehiya xwe tevî lîseyê li heman cihî bir serî. Di kovar û rojnameyên TÖB-DER, Aydınlik, ABC, Yeni Ülke, Yeni Politika, Özgür Gündem, Welat, Welatê Me û Azadiya Welat de meqale û rêzenivîsên wî hatine weşandin. Der heqê rêxistinbûna mamosteyan de 2 pirtûkên wî û di sala 1991'ê de jî pirtûkeke wî bi navê "Kurdistan Teali Cemiyeti" hate weşandin. İsmail Göldaş hê jî, li ser sistema siyasî ya Tirkiyeyê, diroka demokratîkbûnê û diroka kurd de xebat û lêkolîna xwe didomî ne.

SERWISA ÇANDÊ

KOVARA LÊKOLÎN û LÊGERÎN

## war

ARAŞTIRMA - İNCELEME DERGİSİ

- MÊM û ZİN VE EDEBİYATIMIZDAKİ YERİ  
Remezan ALAN
- KOÇGIRI'DE İKİ KİŞİLİK:  
Sakallı Nurettin Paşa ve Ebubekir Hazım Bey  
İsmail GÖLDAŞ
- Yavuz Sultan Selim'in Diyarbakır'ı Fethi ve Egemenlik Altına Alması  
Ali EMİRİ Çev: Abdurrahman UÇAMAN
- KÜRT DİLİNİN DÜNYA DİLLERİ ARASINDAKİ YERİ  
A. ALI
- ÇEND GİSEY FERHENG - VAJNAME'DE Kurmançî - Hewramî - Dimilî û Senendecî Serê  
Abdurrahman UÇAMAN - Seîd VERROJ
- Besimbuhar Yan Ji Kormîkanî: Pîroz Kirina Hatina Buharê  
A. TURK
- FOLKLORA KURDİ  
Seîd VERROJ

HEJMAR - SAYI 1 MAVİN - YAZ 1997

ran tê nîşandayîn.

Di destpêka kovarê de tê gotin ku, armanca derketina kovareke bi vî rengî ji bo berjewendiyên çandî ên kurdan; ango pêkanîna lêkolîn û lêgerînên li ser ziman, wêje, dirok, folklor, huner e. Her wiha di destpêkê de tê îdiakirin ku, kovara War valahiya ku li holê ye wê dagire.

Beriya ku ez naveroka kovarê hildim dest, ez dixwazim rexneyekê li rêveberên wê bikim, lew-

## Ez mame şaş

CELALETTİN YÖYLER



Birêveberên rejîma fermî ketine nava gerdava gemariya bir û baweriyên xwe yê nîjadperest û rast û çep di nav de çepilên xwe dikutin. Yek ji wan doza heşt sal perwerdehiya li ser hev dikê û dibêje: Ji me re pêwist e ku em gavan ber bi perwerdehiya nûjen û hemdem ve bavêjin. Yekî din jî bi ramana nîjadperestîya bi mêtîngeriya olî li hemberî wan dertê û dibêje: Perwerdehiya heşt salan li serhev pêşber e û astengiyê li pêşiya xwendinên îslamî û olî dertîne. A, ez jî vê bigirkêşiyê û gelemşeya wana di warê gelşên ramanî de, mame şaş û mat. Lewre ne bawerîya min bi pêşverûti û hemdemîya wan ên "Kemalperest", ne jî bi îslamiyên wan ên "Fatîhperest" tê. Lewre ev her du aliyên ku dibêjin: Em, xudanên ramanên cihêreng in, ew di taybet û ponjandinên xwe yê nîjadî de, çêlikên yek dayikê û zarokên yek binêmalê ne. Daxwaz û armançên wan xapandin û talankirina nîrx rêz, rûmet

çanda gelê kurd û xwîn mijandin û mêtîngeriya çîna karkeran e. A, ji ber van ramanên han ên ku rastiya wan dertîne navêndê û li pêş çavê kesên xwenas û zana, li ser vê nexşeya vî welaîf, ez dixwazim mînakê jî gotinên gelê kurd ji xwendevanan re diyar bikim. Dibêjin rojekê du heb kesên diz ên bi nav û deng, di çolekê re diborin û dibînin ku cotkarek zeviya xwe şov dike, yek ji wan dizan ji hevalê xwe re dibêje: "Ez gayekî vî cotkarî bidizim?" Hevalê wî jê re dibêje: "Lawo kul di maîla bavê te keve, ma ga cot di destê mêrik de ye û cotê dike, tuyê çawa li ber çavê wî, gayê wî jê bidizî?" Divê tu li vî diyarî here û were têxe hewar û bibêje: Ez mam şaş, ez mam şaş, ewê serê xwe bilind bike û li te binêre, ezê jî tele tel ji kêlekê ve herim gayê wî berdîm û berjêre nawale bikim. Diz plana xwe pêk tîne, gayê xwe dajo dixwe newalê. Cotkar dibêje: "Kuro çi bûye?" Hevalê diz li jor dibêje: "Kuro tu bi gayekî çawa cot dikî? Ji bo vê ecêbe ez mame şaş." Xwediyê cot vedigere li cotê xwe dinêre, dibîne ku bi gayekî cot dike. Ew jî dixwe çîr dibêje: "Ez jî mam şaş, ez jî mam şaş." Belê em gelê kurdê bindest her tim hatine xapandin û me wekî cotkar gotiye em mane şaş. Lê bi zanîna min êdî nîjadperest bi listikên xwe yê ne mirovahî nikarin me bixapînin û dizîya ax, av, serax, binaxa me bikin. Van hê jî dest ji mebestên xwe yê xirab bermedane. Dixwazim bi

navê perwerdehiya hemdem zarokên kurdan vehelînin û ji çanda wan ji zimanê dayîka wan dûr bixin. Jixwe ev mebesta xirab ji bo wehelandina zarokên kurdan, di biryara "Heyeta Ewlekariya Neteweyî" de hatiye rojevê. Lê bira ew baş bizanibin ku hemû mebestên wan ên xirab wê bêne pûçkirin. Lewre kurd ji wan qonaxên tarî borîne. Êdî tu kes bi şaşkirin û xapandinan nikarin gayên wan bidizin. Ji ber ku ew êdî hişyar in û nerazayî ne, bi sazî û rêxistinên xwe, bi çapemenî û bi rewşên birêxer xwe bi hêz in û li ser piya ne, ber bi rizgariyê dimeşin. Rejîm her tim dixwaze, rojevê biguherîne. Rojeva pir girîng û pêwist doza çareserkirina pisgirêka gelê kurd e. Lê rejîm jî ber ku naxwaze vê pisgirêkê çareser bike, her tim rojeva xwe bi hînek tiştan diguherîne. Wekî çawa ku bi hazeran gund û warên gelê kurd şewitandine bi hezaran zarokên kurdan bêperwerdehiya seretayî mane, ew qala perwerdehiya heşt salan dike. Hem jî bi hezaran karker û gundî û bajarî nikarin nanê xweyê rojane peyda bikin, ew qala xwendina "bang" a bê hoperlo dikin. Ev hemû xapandin in ji bo kesên bindest ên li ser axa vî welaîf. Divê dev ji xwe xapandinê berdîm û werin ser xeta rast, ew jî her pejirandina doza gelê kurd e. Heta ku ew neyê çareserkirin, perîşanî, belengaziya hemû çînan nayê çareserkirin.



# Çakêtê min nelewitîne



**S**ilêman xort e. Dawet li dar ketiye û dengê def û zirnê dilê Silêman disoje, bila mala xizaniyê bişewite, Çakêtêkî Silêman tune ye ku li xwe bike û wekî gundî û cîranan here govendê. Bala xwe didê ku hevalê wî Mehdi, çakêtêkî nû ji bajêr kiriye. Mehdi çakêtê xwe yî nû di nava heft

kincan de girê dida û bi singê malê ve dikir. Ji her du cejnên pîroz pê ve tu kesî ew çakêt li Mehdi nedidit.

Silêman çû xwe avête bextê Mehdi:

– Lawo Mehdi vê carê û ne tu carên din. Ez ketime bextê te tu dibîni govend geriya û xort û qîzan erd hejandin. Ji kerba re ez dikim bimirim. De rabe

bi qedrê gora diya xwe bikî tuyê wî çakêtê xwe bidî min û dû re tu çî ji min dixwazî, bixwaze.

Mehdi ne pir bi dilê wî ye, lê belê xwe ji dest Silêman xelas nake, radibe çakêt ji sing dike, dide Silêman û wî bi rê dike. Wi bi rê dike belê dilê wî di nav çakêtê wî de ye. Ji xwe re dibêje: “Min çakêtê xwe da Silêman, dibe ku çakêtê min bilewitîne. De ka ez bi lez herim jê re bibêjim bila çakêtê min nelewitîne”.

Silêman berê xwe dide govendê û bi lez dimeşe. Mehdi li dûv wî ye. Gava ku li paş xwe dinêre Mehdi dibîne. Silêman di dilê xwe de dibêje: “Mehdi Poşman bûye tê ku çakêtê xwe bixwaze, Xwedê wekîl ku bê ez hetikim.”

Mehdi ji paş de xeber dide. Dibêje: – Silêman kuro binêr tu çakêtê min nelewitîni. Silêman di cih de disekine û li hêviya wî dimîne, bi dengêkî nizm dibêje:

– Lawo Mehdi malhexirabo tuyê min bihetikîni. Li govandê jî tu vî tiştî nebêjî ha! Bila kes nizanibe ku ev çakêt ê te ye. Ma min dinya nedîtî ye ku ez rabim çakêtê te bilewitînim.

Her du heval bi hev re ketin nava govendê. Kêfa Silêman li cih e ... Xwe qure dike, geh dikeve serê govendê

desmalê dihêjîne, geh ji dilanê derdikeve û bi def û zirnê re dipeke. Radibe û rûdine...

Çavê Mehdi ji Silêman bîstekê qut nabe. “Gelo ku ez li Silêman nenêrim û yan ez ji vir herim wê Silêman çakêtê min bilewitîne. Na weleh heta ku ev govend belav nebe, çûna min tune. Hima hesabî ez jî weke Mehdi di govendê de xwe dihejînim.”

Silêman ji eşqa çakêt re serxweş bûye. Xwe nabîne, govend bi xêra Silêman geş dibe. Xwedan wekî avê ji eniya Silêman diniquete. çakêt ji xwedanê şil dibe. Çavên Mehdi di nav serê wî de dilîzin û bi dengêkî bilind heta ku jê tê: – Lawo Silo qeda bi te keve, çiças min ji te re got. Ê te çakêtê min lewitand wî!

Silêman bû wekî ku tu ava sar pê de bikî ji nav govendê kişiya û hat li ber Mehdi sekini û çakêt ji xwe kir û avêt bin lingê xwe û pêlê kir, di nava tozê de kire nava heriyê û li rüyê Mehdi nêri û bi hêrs çakêtê tev bi herî û şil avête ser Mehdi û bi qehr:

– Ne tu bî, ne çakêtê te be, ha ji te re çakêtê te bixwe serê te û heştêd bavê te, de here.

ADAR JIYAN

## BIXELAT... XAÇEPIRSA BIXELAT (82) XAÇEPIRSA

Navêkî Mîrwan Lêwî Kurdî	R	Lew qêr, wê	T	Hi destê wî Pê biwan	A	Dajbera ya Pirtûka 1975	E	Şere wê Nawezan	T	Hegmarêk	
	R	O	J	E	N	B	A	R	N	A	S
Agilimê ya	Z	A	N	A	De giran Lêwêk	B	E	A	R	I	
	T	E	R	S	E	D	Çimêkî Nawê Fêhwa	V	I	Li nêrî Pêrê çî yê	
Hegmarê Mîrwan	R	S	M	Z	Fêhwa Nawê Nawê	Y	I	A			
	S	I	N	A	T	N	E	N	A	S	
Kêfa Çimêkî	N	Û	Z	E	N	Û	Z				
	O	B	I	S	A	R	I				
Berê Lêwî Kurdî	B	Û	S	O	T						
	Q	A	N	I	A	J					

### Bersiva Xaçepirsa 80'yî

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, emê wan binixînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 82'yan, Kasete Şivan Perwer (Hay Dil/Xanê)ye



**Jêrenot:**  
A bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmara 80'yî Pirtûka Beyani Şahin qezenc kirine. İbrahim Fîlîz/ Amed, Muhammed Necat/ Sêrt, Efi Bekir/ Stenbol, Casîm Tan/ Qers, Şexmûs Çal/ Culemêrg

Jina navsere	Xwarina sewalan	11	Ayende	Kijan	Parkit	Hacetê cot
Kesê di wêne de	Karin		Sedsal	Navroj	Dayik	
						4
Pêşgerek	5	Gihayekî bibêhn		Janin dema borî Cînavkeke şanedani	3	
Fêkiyek			Vexwarina sereke Bi tirkî leşker		Kurtiya gramê	
					Cînavkek	
Jêhatî		2	Dildari Li hev hatin			Tipeke kurdi
Kurt						
	9	Xweli		Cephe		
		Is		Dem a berî şevê		
Tipek		Tîpên dengdar, ên 'teşîyê Ne pijiyayî		Bi devokî nayê		
	10	Tiştê ji xetê Tevgera hewayê			Paşgerek	
Cihê bilind Jêderk		6		Kêfxweş	7	
				Pê masî tê girtin		

PEYVA VEŞARÎ

1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11
---	---	---	---	---	---	---	---	---	----	----





### Dekstpek Rûpel 16

Bo gihîştina armacê ev beşdarî û tevlibûna ji her hêlên Ewropayê çêbû, yan kêmasî di vê derbarê de heye?

Em bendeyî 4 hezar kesî bûn ku bîn û di trûbînan de rûnin. Yanî li gorî çavdêriyan pir kes hatine, çar û nîv di ser hêviya me re kes hene. Ji bilî kêmasiyên teknîkî, kêmasiyên din jî pêk hatin. Heger di pîrsa te de, kom û rêxistinên derî me hebin jî, pêdiviya şîrovevî li ser wan nîn e.

Derbarê spormendên ku tevî festîvalê bûne de tu dikarî agahiyêke bi hejmar bidî me?

Di derbarê spormendiye de 300 kes. Di hêla xwepêşandana nîgarî de jî 200 kes. Û kesên ji her cureyî jî hene ez wê hejmarê nizanîm. Ji ber ku duh jî, îro jî hinek kesên ji xwe qayil ku xwestin bikevin pêşbaziye curreyî û serlêdan kirin, hene. Festîval nû ye, yekemîn car ku di nava kurdan de tiştekî wiha pêk tê. Lewma jî me destûra serlêdan û ketina pêşbaziyan da. Îcar ew hejmar bi komîsyona pêşbaziye re heye. Kêm zêde, hejmara spormendan li derdora 500 û 550 kesî ye.

Bo spormendên kurd ku zîrek û jêhatî ne, yanî di radeya tevlibûna pêşbaziye navneteweyî de bin, amadekariyêke we der barê tevlibûna festîvalên navneteweyî de heye?

Ev karekî pir giran e û binbariyê dixwaze. Lê wekî gelên cihanê ku em jî xwe danîşan û danasîni cihanê bikin, dibe û hinek gav jî hatine avêtin. Divê ku neyê jibîrkirin da ku em di hêla sporê de amator in. Yanî, divê ku di her hêlê de em hebin û li gorî hêz û himmêta xwe gavên xwe biavêjin.

Maratonvanê (Mustafa Tezcan) ku meşaleya Azadiyê ya Kurdistanê hilgirt, got ku min di pêşbaziye navneteweyî de heya îro 11 madalyonên zêr standine. Û diyar kir ku di rojên pêş de wê bikevê pêşbaziye navneteweyî. Di vê hêlê de hûn dikarin çapîştgirî û alîkariyê bidin wî ciwamêrî?

Mustafa, ciwamêr mirovekî jêhatî û zîrek e, bi xwe gihaye vê radeyê. Bi zîrekî û jêhatîbûna xwe li ser navê gelê kurd dikeve pêşbaziyan û danasîn û danîşana kurdan li cihanê pêk tîne. Berî niha jî min got hinek gav hatine avêtin, pêşeroj wê van gavan nîşanî we bidin.

Me dîtin û ramanên Maratonvanê Navneteweyî ku Meşaleya Azadiya Kurdistanê hil-



girt û di festîvalê de beziya Mustafa Tezcan jî stand. Wî pirsên me wiha bersivand.

Piştî maratoneke dîr û dirêj, we xwe gihandê Festîvala Mazlum Doğan a Spor û Çandê ya Xortan. Di hêla amadekirina festîvalê de tu dikarî çî ji xwendevanên me re bibêje?

Niha wekî ku hûn dibînin coşiyek pir mezin û dilgermî heye. Ew dixwazin ku coşî û dilcoşiyek wiha bijîn. Ev festîval karê salên dîr û dirêj e. Salên dîr û dirêj... heya em gihane vê qonaxê, berdêlên mezin hatin dayin. Komên xelkê, festîval di rewşek coşî û dilgermiyêke mezin de berhembêz kirin. Me pir kar kir. Me kar kir, li ber xwe da, li hemberî nezanîna, tunebûna û kêmasiyên xwe teva, festîval li dar xist û pêk anî. Em bi ser ketin.

Hûn organizasyonê, mîna tiştên amade,

yan jî tiştê ku we dil dikir, hûn xwe serketî dibînin?

Organizasyon pir baş hate amadekirin. Her tişt li gorî standartên Ewropa nebin jî, pir baş bû. Festîvala yekemîn e, yekemînî pir girîng e...

Em bi ser ketin... Di festîvalên bê de bêhîr serketin û organizasyonêke rêkûpêktir mimkûn e. Emê festîvalên pir mezin çêbikin. Festîvala rastî û a bi nîrx li Kurdistanê azad wê bê çêkin. Bi piştgirî û alîkariya gelê me û gelên ku bi me re li Kurdistanê dijîn hêviya me bi pîrozbahiyek mezin heye. Em dê vê pêk binin. Soz û peyman me bi gelê me re heye. Ezê, maratonvanê azadiyê yê Kurdistanê, bi xwe, agirê festîvalê li wir hilgirim û hildim. Ez vê sozê jî didim.

Baş e, çi qas maratonvan beşdarî festîvalê bûn, tu dikarî hejmarekê bidî me?

Niha, min rahiştê agirê maratone û anî. Ez wekî maratonvan bezîm. Di encameke sembolîkî de beza 10.000 m. yî de 30 kesî qayîşa hev û din kişand û heya dawî bezîm. Di şaxên din de, jin 100 m. 400 m. bezîm... Mêr, 100 m. 400 m. bezîm... Û ev bez qayîşkêşa di navbera spormendan de li gorî standardên navneteweyî çêbûn. Ez dikarim bibêjim ku festîval di vê hêlê de serketî bû.

Bo tevlibûna pêşbazî û tirata navneteweyî we serlêdan kirine, yan hûnê bikin?

Ez bi xwe di qada navneteweyî de xwediyê 11 madalyonên zêr im. Li ser navê Kurdistanê min ev madalyon tev standine. Ez niha li ser daxwaza hevalan û amadekirina vê festîvalê jî Pehlewaniya Navneteweyî ya cihanê ku li Atêna çêdibe derketim û hatim. Ji bo festîvala gelê xwe, ku di dîroka Kurdistanê de yekemîn care tê pêkanîn, ji bo ku ez wê bi rêkûpêkî amade bikim, kar bikim, ez hatime vir. Ji ber ku beşek vê amadekariyê li ser milên min e.

AZADIYA WELAT/ BIRÛKSEL

## Ferhengok

lêmîşt: lehî  
lomandin: lomekirin  
mirûz: med  
mîna: wekî  
mêjû: dîrok  
nakokî: dubendî  
nasnav: hûviyet (kimlik)  
navgîn: hacet  
nimandin: binavkirin  
pêrginî: pêşwazî (karşilamak)  
pêşbazî: berebazî (yarîşma)

ragihandin: komûnikasyon (iletîşim)  
ravekirin: îzahkirin  
selmandin: îspat kirin  
şermane: eybî  
şerê kendavê: şerê xaliçê  
şewe: awa  
şifirin: hûr û mûr bûn  
xala veçerxê: noqteya girîng  
vîmî: berî dema xwe zayîn  
zar: ziman  
zarhişk: kesê ku tûj diaxive  
zivêrbûn: acizbûn  
zîrek: jêhatî

bilêvkirin: telefûzkirin  
ciniqandin: hilciniqîn  
çareserî: helkirina pîrsgirêkan  
çespandin: selinandin  
çors: ziman nexweş  
dahatû: pereyên ku tîn  
destkarî: mûdahale  
destnîşankirin: tespîtkirin  
erdhejin: hezek, zelzele  
gengeşî: nîqaş, gotûbêj  
geşedan: perisîn, gehîştin  
hêman: unsûr  
heman: eynî

## WELAT

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
Zerya Basın ve  
Yayınçılık  
San. Tic. Ltd. Şti.  
(adına)  
Xwedî (Sahibi)  
CELALETTİN  
YÖYLER

NAVNÎŞAN  
Ayhan Işık Sk. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL  
TEL-FAX  
(0 212)  
251 90 13

Gerîndeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên  
Nivîsaran  
(Yazı İşleri Müdürü)  
M. SALİH TAŞKESEN

Berpîrsê Saziye  
(Müessese Müdürü)  
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.Ş.

BELAVKIRIN  
BİRİYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME  
(Temsilciliklerimiz)

Brüksel:  
Medenî Ferho  
32 532 721 12 03  
Suriye:  
Jan Dost  
Helîm Yûsiv

Berlîn:  
Silêman Sîdo  
49 30 69 03 26 95

Hannover:  
Sefîm Biçûk  
49 572 18 13 60

Munchen:  
Mahmut Gergerli  
49 871 67 08 84

Stockholm:  
Robîn Rewşen  
46 87 51 05 64

Bonn:  
Ahmet Baraçkılıç  
49 228 66 62 49

Hollanda:  
Ferhat Zebarî  
31 104 85 55 48



# Festîvala Mazlum Doğan a Spor û Çandê ya Xortan bi serkeftin qediya

**Amedekarê Festîvalê Kemal: Welatê gelên ehanê ku em ji nek gav ji hatine evêtin. Divê ku neyê jîbîrkirin da ku divê ku di her hêlê de em hebîn û li gerî hêz û**

**F**estîvala Spor û Çandê ya Xortan bi Navê Mazlum Doğan Yekemîn car li Ewropayê li Leuvena Belçikayê hate çêkirin.

Festîvala Spor û Çandê ya Xortan bi navê Mazlum Doğan, di dîroka Kurdistanê de cara yekemîn, li ser bingeha tola têkoşînê, 2'yê gelawêjê, li Belçîka bajarê Leuvenê, bi beşdariya derdorê 600 xortên ku ji her hêlên Ewropayê hatibûn, li stadyûma bajêr hate pêkanîn.

Bi coşî û dilgermî bi hezaran kurdî li çalakîyên werzişî temaşe kir. Festîvala ku sê rojan berdewam kir û pir hozan û hunermend ji beşdar bûn û hunerê xwe pêşkêş kirin û ji hêla MED-TV'yê ve zindî hate weşandin, di navbera xortan de di şaxên pir-hêlî yê werzişê de pêşbazî û tiratên mezin hatin pêkanîn.

Roja yekemîn bijartina giştî dest pê kir. Şaxên pêş-

û Med-spor (Hollanda-Den Haag) di dama listika futbolê de hev û din tîk nebirin û di deqîqeya 16'an de Çetin Akdağ, bi gola pêkhatina penaltî ve Mazlum-spor bi pêş ket, di dewra duyemîn de ku Remzî Pehlewan (MED-TV) di deqîqeya 57'an de, di pêgiha tawanî (ceza sahasî) de goleke din avêt; 1:1 bi hev û din re man. Heya deqîqeya 90'î ji torên kaleyan gog nedîtin



û bi darbeyên gogê nehatin hejandin. Ji ber vê çendê hekem maç 10 deqîqe dirêj kir. Di vê demê de karta sor ku mîna her tiştî ew ji di dîroka Kurdistanê de nû bû, hate dayîn. Piştî dirêjkirina maçê ji tu guherîn di navbera her du komên futbolê de çênekir. Her wiha bi penaltiya dawî ku ji taximê Mazlum Doğan, Abdurahman Marmariyan avêt, koma wî bi ser ket û bû xwediyê kupaya-dîrokî ya festîvala yekemîn.

Bi pêkhatina şaxên din yê sporê bi dilgermî û coşî ji hêla gel ve bi balkêşî dihatin temaşekirin.

karê bijîşkî kiriye. Yanî, di vê hêlê de mirovekî azmûn im. Hevalê min Remzî jî wilo, karê bijîşkî kiriye û xwedî azmûn e. Di vê festîvalê de ji aliyê pêdiviya bijîşkî ve tu astengiyên me nîn in.

*Dr. Rodî, dijmî nehîst ku tu li welatê xwe pişeyê xwe yê bijîşkî bikî. Tu li vir di nava komên xelkê kurd de, karê xwe bi zamanê zikmakî dimeşîni. Vê kêlikê tu di nava hestên çawa de yî?*

Dema ez li Kurdistanê bûm jî, di nava gel de bûm. Min di karê muayene û dermankirinê de ji gel pere nedistand. Ji min re digotin: 'Tu pera ji mirovan nastîni, lê mirovan ji PKK'ê re didî hev.' Min ji wan re got: 'Ez karekî mirovaniyê dikim, car heye ku ez pera distînim, car heye ku ez pera nastînim. Yanî mirovaniya dilgermî qebûl nedikirin. Lewma êrîş anîne ser min. Ji îro şûn de ez li vir di nava gelê xwe de kar dikin û karê xwe yê bijîşkî pêk tînim.'

**Her wiha me bi amadekarê festîvalê Kemal re ji der barê armanca festîvalê û amadehiyên wan de hevpeyvînek pêk anî**

baziyê ku bi tiratek dijwar derbas bû ev bûn: Futbol, tekvando, kickbox, gule (disk cîrît) avêtin, atletîzm (bazdan) (100-400-100 m, û 4x100 m beza bi al) tenîsa li ser masê û karate... Futbol, bi 2 koman ku 10 taxim (tîp) bûn hatin hemberî hevûdin û listin. Komên ku di futbolê de bi ser ketin ev bûn: Med-spor (Belçîka), Med-spor (Hollanda), Xortên Kurdistan (Fransa), Serketin-spor (Swîsre), Serhat-spor (Ulm), Botan-spor (Almanya-Köln), Dicle-spor (Almanya-Celle, Hannover), Mazlum-spor (Almanya-Stuttgart), Yekîtiya Xwendevanên Kurdistanê (YXK) û Engîzek-spor (Almanya-Essen).

Roja duyemîn ku komên futbolê hatin hemberî hev û din, MED-TV bi amadekariyêke pirhêlî dest bi weşana zindî kir. Her çiqasî ne li welat hatibû amadekirin jî, ji hêla komên xelkê ve ku ji her welatên Ewropayê bi otobusên ku bi ala rengîn hatibûn xemilandin li dûv hev û din bûbûne rêz.

Ev festîval roja 3'an berêvarî bi dilcoşî û şahîyêke pir mezin xelas bû. Bi hezaran kurdên ku ji her hêlên Ewropayê hatibûn bajarê Leuven ku paytexta Flenmanan tê hesabandin, gihabûne hev û din. Bi sedan spormend (wezişvan) û xortên baz, di nava cil û kincên leşkerî de pêçayî, rengenîgariyêk dane festîvalê. Her wiha di dîroka Kurdistanê de, ev festîval cara yekemîn bû ku diqewimî, bi dayîna kupa, madalya û xelatan bi dilcoşiyêke mezin qediya.

Roja dawî ku 2 komên futbolê di tirata finalê de ketin zîqa hev û din; Mazlum-spor (Almanya-Stuttgart)

Festîval di nava çepik û awazvedanên (tezahurat) dilgerm û dilcoşiyê qerebalixê jin û mêr, dot û xort û zarokan de, berêvarî li gorî Ewropa saet li derdorê 5-6'an xelas bû.


**Ji bo tenduristiya spormendan ji Heyva Sor a Kurdistanê Serwîsa Acil (Pêdiviya Lez) jî li wir amede bû. Me li ser xebatên wan ên li festîvalê çend pirs arasteyî Dr. Rodî kirin.**

*Birêz Dr. Rodî, tu dikarî der barê amadekariya Heyva Sor û beşê pêdiviya lezî de agahdariyan bidî me?*

Di vê festîvala Mazlum Doğan de, Heyva Sor binbariya xwe anî cih. Heya niha, gelek spormendên ku birîndar bûne, nexweş ketine, hatine bin çadira beşê pêdiviya lezî (serwîsa acil) û me birînen wan pêçane. Birîndar û nexweş teva, hê jî di bin kontrola me de ne.

*Ji hêla bijîşkî ve ku kêmasî hebîn pirsgrêkek mezin e, gelo kêmasiyên we hene an na?*

Ez dikarim vê bibêjim, min 19 salan li Kurdistanê



*Bo festîvalê we amadekariyêke çawa kir?*

Bo amadekariya festîvalê me tîkîlî bi dewleta Belçîka re danîn û serî li belediyeyê bajarê Leuven da. Têkiliyên me yê baş bi belediya Leuven re hene. Bi piştgiriya wan festîvalê pêk hat. Bêguman beşdariya politîkî bi alîkarî û piştgiriya Rêxistina Xortan ya Ewropayê çêbû.